

welat


Sal:2 Hejmar: 68 6-12 Heziran 1993 5000 TL (KDVD)

Rojnameya Hefteyî

Ahmet Türk:

'Wê Kurd
xwe bi xwe
xelas bikin'

Rûpel 3





Li Bonnê zêdeyî sed hezarî Kurd her bi yekîtiyê ve meşîyan

MEŞA AZADIYÊ YA MEZIN

● Ewrûpa careke din ji livbaziyan Kurd re mazûvaniyê kir. Piştî meşa Brukselê, festîwala Bochumê, greva birçîbûnê ya mebûsên Meclîsa Neteweyî vêca Bonn ji livbaziyeke girseyî re bû dik û sahne. Gelê Kurd bi navê Meşa Azadiyê ya Mezin armanc û daxwazên xwe li Bonnê nişani dinyayê dan û bi yek dengê qêriya.

● Di Meşa Azadiyê ya Mezin de ku bi yekîtiya partî û rêxistinên Kurd ve pêk hatibû, ji 100 hezarî zêdetir Kurd ji bo armancekê meşîyan. Ji bo azadî û serbixwebûna welatê xwe. Nivîskarên me Dilbixwîn û Nihat Dirêj ji destpêka meşê ta dawiyê ew şopandin û çavdêriyan xwe, întibayên xwe ji bo nivîsandin.

Rûpel 8




Berpirsiyarê Giştî yê rojnameya
Riya Teze Emerîkê Serdar:

'Rojnameya me temenê Kurdên Sovyetê ye'

"Em li têkoşîna rizgariya neteweyî û li pêşengên wê xwedî dertên. Em nêzikahiyeke mezin jê hîs dikin. Di weşanên me de ev xal girîng in."

Rûpel 13



Bi Ciwan Haco re hevpeyvîn

"Ez naxwazim navekî muheddet li muzîka xwe bikim, lê bi gelemperî dikarim navê 'muzîka Kurdî ya nûjen' lê bikim. Gava dibêjim nûjen, behsa reng û naverokê dikim." Rûpel 16

Bawerî bi dewleta Romê nayê!

Şer dîsa dest pê kir. Ji bo şer-rawestîne hemû gavên gel, ji aliyê dewleta dagirker ve bi-çûk hate difîn û weke ku he- nekê xwe pê bike, çiqas gel aşti xwest, dewletê ewqas êrîşên xwe yên hovane bir ser şerrawestîne; weke fersendekê şîrove kir û cihên ku berê nikaribû têkeve ketê. Gel di îşkenceyan re derbas kir û hin ji wan jî xist girtîgehan. Bi vê tenê jî qîma xwe neanî, gund şewitandin, gundî ji gundan qewitandin, koçer talan kirin, pez û dewarên wan kuştin, ji wan standin û an jî nehiştin ku heywanên xwe derxin çolê biçêrinin. Û bi hezar cureyên zilmê.

Di dema vê şerrawestîne de, nêzî 30 gund hatin şewitandin û talankirin. Nêzî 90 gerîla hatin şehîtkirin û hej- mara birîndaran jî, nayê zanîn bê çiqas e.

Bê çawa di jiyana mirovan de sebir heta cihekî ye, di têkiliyên civakî û politikayê de jî heta cihekî ye. Ji roja pêşî ve dewletê guh neda şerrawestîne, belê gel bi hêviya ku dewlet bi kêmasî li ser pirs- girêka Kurdan ji berê bêhtir bisekine sebir kir. Hate kuştin sebir kir, talan bû sebir kir, binçav bû, di îşkenceyê de derbas bû sebir kir. Lê nêzî du mehan derbas bû, ji aliyê dewleta dagirker ve tu gavên ku vê hêviyê xurt bike nehatin avêtin. Dev ji gavên ku vê hêviyê xurt bikin berdin, hêviya ku hebû jî, ji holê rakirin. Tiştê ku dewletê kir, xwest ku wext qezenç bike û digot, "Emê di Tîrmehê de Rêvebirîya Taybetiyê (Olaganüstü Hal) rakin, emê mafê çandî bidin, emê cerdevaniyê (koricîtiyê) rakin û hwd. Lê her roj diçû derewbûna wan sozan derdi-

ket. Vê rastiyê, gotina ba- pîrên Kurdan dianî bîra Kur- dan "Bawerî bi leşkerê Romê nabe" Rast e. Bawerî ni bi leşkerê Romê û ne jî bi dewle- ta Romê dibe.

Bi rastî, ji roja ewilî ve ba- weriya min bi xwe, bi dewle- ta Romê qet nehatibû. Belê hin mirovên ku dewleta Romê! nas nekiribûn û hîna hêviya xwe ji vê dewelata ku ji dîroka xwe ve talankar û zilm- kar e, nebiribûn da naskirin.

Li gorî ku di vê dema kurt de dewletê xwe bi hovîtiya xwe da nasîn, divê em jî xwe bi şoreşgertiya xwe, xwe bina- sin! Xwenasîn berî her tiştî, zanîbûna çixwestîne ye. Her Kurd û her rêvebir divê baş bizanibe bê çî dixwaze û li go- rî van daxwazên xwe bimeşe. Ev daxwaz dibe ku pîrr hindik bin û dibe ku pîrr zedê bê xu- yanî (bi rastî ji bo gelên bin-

dest tu daxwazên zêde tune ye. Ji ber ku weke her mi- letên din daxwazên wî, jî mafê wî ye!) çawa dibe bila bi- be, li gor wan daxwazan, me- şa wan, wê duristbûna wan deyne holê!

Îro ji bo gelê Kurd, kes ne- ma kare bibêje çima zora şo- reşgerî dixebitîne? Gava ku her rê li ber gelê bêtir, ew gel bi çî awayî karibe xwe bî- ne zimên, wê xwe bi wê riyê bîne zimên û kes nikare gazi- nan bike, ji bilî (xeynî) kesên li dijî şoreşê!

Gelê Kurd îro ji her rojê bêhtir bi hêvî û bawarî ye. Di dîroka xwe de tu caran weke îro yekîtiyê û siyaseta xwe nedî- tiye. Ji bo şoreşê jî, jixwe ev herdu şert bingeh in. Ev rastî îro li Kurdistanê bi xwîna şe- hîdên pîroz her roj hîn bêhtir xurt dibe.

Î. Xort

FERHENGOK

- Banandin:** (Alışmak)
- Banek:** Hînbûyî (Alişkın)
- Berepêş:** Bi pêş ve
- Berepaş:** Bi paş ve
- Bexş:** Şabaş, bexşîş
- Celeb:** Cure, çeşît
- Daringî:** Madî
- Destmiz:** Bedelê xebatê (Elemeği)
- Destşo:** Lavabo
- Damezrawe:** Sazende, dezgeh, muessese
- Dêris:** Wêran, mefbûyî
- Dêrisandin:** Mefkirin
- Ewiqîn:** Oyalanmak
- Hewisîn:** Hînbûn
- Hêvojkar:** Perwerdevan (Eğitimci)
- Hînger:** Dîdaktîk (Öğretici)
- Hevkarî:** Bi hev re kirina karekî (İşbirliği)
- Histûmal:** (Kaşkol)
- Hilm:** Nefes
- Kanûn:** Kuçik, tifik, argûn
- Mehmiz:** Meaş, heqê mehê
- Miz:** Bedelê kedê (Ücret)
- Nivîsmend:** Katib (Katip)
- Nevî:** Torin
- Nevîçirk:** Torinê torin
- Nîfş:** Kuşak, nesil (Kuşak)
- Pan:** Bendewarkirin
- Pergal:** Sazûman, sistem
- Pêseroj:** İstikbal (Gelecek)
- Ramîn:** Fikirîn, hizrîn (Düşünmek)
- Rênc:** Zehmet
- Rêncber:** Zehmetkêş
- Ronîker:** (Aydınlatıcı)
- Serşo:** Cihê ser şuştinê, hemamok, banyo
- Suxte:** Şagirt (Öğrenci)
- Şop:** Taqîb
- Şopandin:** Taqîbkirin
- Şêlandin:** Tazîkirin (soymak)
- Şêlin:** (Soygun)
- Şêlinkar:** (Soyguncu)
- Şihitin:** Mexdûrbûn
- Temen:** Emr

"Apê Ho" di sala xwe ya 103'yan de!

"Yek ji du pêkerên herî gi- rîng di derketina tevgera me ya partiyê de Şoreşa Vîetnamê ye, a din jî Tev- gera Şoreşger a Ciwanî ya Tirkîyê ye."

Serxwebûn, Kanûn 1988

Şoreşgerê welatparêz ê mezin, sazgerê Partiya Kom- unîst a Vîetnamê Ho Şî Mînh di 19'ê Gulana sala 1890'an de li Vîetnamê hate dinê. Îsal em, salvege- ra wî ya ji dayîkbûnê ya 103'yan bi bîr tînin.

Ho Şî Mînh di dema

Şerê Yekemîn ê Cîhanê de ji bo xebatê çûbû Fransayê. Li wir ew ket nav Partiya Sosyalîst a Fransa û bi navê Nguyen "Aî Quoc", ku tê wateya "welatparêz", nivîs li ser rewşa gelên bin- dest ên li Rojhilatê nivîsan- din. Di vê demê de Nguyen bi rastî jî bi tenê welatparêz bû, li ser sosyalîzmê tu tişt hê jî nexwendibû. Wek ku Y. Küçük di nivîsa xwe ya bi navê "Apo (A. Öcalan) Ho dixwîne" de dibêje, Şo- reşa Cotmehê çavê wî ve- kir û wî dest bi naskirina

dîtinên Lenîn kir. Ji vê demê û pê ve, Ho Şî Mînh bû parêzkarê zexim ê lenî- nîzmê. Wî dit ku tenê lenî- nîzm, dikare têkoşîna riz- gariya gelên bindest bigihî- ne serfiraziyê. Ji ber vê yekê jî, Ho Şî Mînh, beş- darbûna Enternasyonala 3'yan parast. Di kongreya Tours, ya sala 1920'an de Partiya Sosyalîst a Fransa navê xwe guherî komu- nîst û bû endamê Înternasyonala 3'yan. Di vê kongreyê de Ho Şî Mînh jî deng ji bo beşdariyê da.

Ho Şî Mînh li dijî dagir- kerên Fransîz û Amerîkan şer kir û Komara Demok- ratîk a Vîetnamê damezi- rand. Serfiraziya gelê mêrxas ê Vîetnamê li hem- ber împeryalîzma Amerî- kan di dawiya salên 1960'an de bû mînakeke pîrr girîng ji bo ciwanên şoreşgerên welatên Rojhi- lat û ji bo ciwanên '68'an.

Bîranîna wî bi têkoşîna çîna karker û gelên bindest a ji bo serxwebûn, azadî û sosyalîzmê wê bijî.

Candan Badem

Che'yê Kurdistanê Hakî Karer

Gelî hevalên hêja; hûn jî dizanin ku roja 18'ê Gulanê roja bîranîna şehîdbûna şer- vanê leheng Che Guevara yê Kurdistanê Hakî Karer bû. Ji bo Che'yê Kurdistanê dixwazim çend gotinan bibêjim.

Ey leheng û şervanê înternasyonalîst Dijmin, nav û dengê te pîrr bihîst Te vatînen xwe qet li paş nedihîst Li ku derê şerê serxwebûnê çêdibû Bi dilgermî te digot ger dem were Ezê ji bin axê serê xwe rakim û şer bikim Ey heval Hakî, şervanê înternasyonalîst Chê'yê Kurdistan.

Te digot serokatiya hemdemî ya PKK'ê ye Ji Serok Apo re Sal 74, bingehê li Çibûk Barajî Bi kils û pola avêt Ji şehîdbûna te ta roja îroyîn

Doz pêşve çû va serxwebûn Dewsa te vala nemaye Che'yê Kurdistan Em ji bîr nakin te, ta ava bibe gerdûn.

Heval Hakî di 18'ê Gulana 1978'an de li Dîlûk'ê (Entebê) bi bêbextî ji aliyê a- janên xwefiroş ve hate kuştin. Ev hevalê hêja û delal bi eslê xwe Tirk û înternasyo- nalist bû. Lewma em jê re dibêjin Che'yê Kurdistanê, na ne bi tenê Che'yê Kurdis- tanê yê Rojhilata Navîn jî bû. Em Kurd û hemwelatîyên Kurdistanê wî di 16 saliya şehîdbûna wî de bi dil û can bi bîr tînin. Şehîd, bîr û baweriya gelê xwe ne, hur- met û şanaziya wan in. Em bi vî rengî li hemû şehîdên xwe dinêrin. Silav li we şe- hîdên şoreşê, silav li we şervanên leheng û Che'yên Kurdistanê

Dilovan Giyadinî / Agirî

Bi daxwaza pêşerojêke azad û serbixwe em cejna we ya qurbanê pîroz dikin.

ROJNAMEYA WELAT

Bi hêviya rojên azad û serbixwe em cejna gelê Kurd û hemû gelan pîroz dikin.

NAVENDA ÇANDA MEZOPOTAMYA

Serokê Partiya Keda Gel Ahmet Türk: 'Wê Kurd xwe bi xwe xelas bikin'

Navenda Nûçeyan- Serokê Giştî yê Partiya Keda Gel (HEP) Ahmet Türk, ji geştê Amerîka vejeriya û der mafê hevditînên xwe û siyaseta Amerîka ya li ser pirsgerêka Kurdî beyanatekê da. Ahmet Türk û Leyla Zana, demekê berê li ser vexwendina Kongreya Neteweyî ya Kurd çûbûn Amerîkayê û bi rayedarên dewleta Amerîka re ji, hevditînên girîng pêk anîbûn.

Ahmet Türk da xuyan ku, li hemû cihên lê geriyane bi pirsê "Kurd çi dikin, çi dixwazin" re rûbirû bûne. Li gorî Türk, heta niha dewleta Tirk li gor berjewendiyên xwe dewleta Amerîka yekalî agahdar kiriyê. Türk, siyaseta Amerîka ya li ser pirsgerêka Kurdî ji wiha şîrove kir: "Amerîka der mafê Kurdistanê de bi taybetî jî der barê Kurdistana Bakur de, xwedî polîtîkayekê ye. Heta niha têkoşîna li Kurdistanê û îhlalkirina mafên mirovan nedixwestin bibînin. Lê, li gor beyanên wan ji niha pê ve de li ser vê pirsgerêkê bisekinin. Ew bi xwe jî dibînin ku ev pirsgerêk bi awayên leşkerî çareser nabe. Ji ber vê jî, bi giranî li çareyên demokratîk xwedî derdikevin û diparêzin."

Li gorî ku Ahmet Türk em agahdar kirine, endamên Kongreya Amerîka, li ser şerawestina ku PKK'ê îlan kiribû nameyekê amada dikin. Ev



Serokê Partiya Keda Gel Ahmet Türk

name dê ji hikûmeta Tirkîyê re bê şandin. Di nameyê de te xwestin ku, dewleta Tirk jî li şerawestîna xwedî derkeve û bersiveke xurt bide vê biryarê, ji bo parastina mafên mirovan û bicihkirina demokrasiyê jî hin gavên girîng bîne avêtin.

Ahmet Türk, li ser PKK'ê nêrîna Amerîkayê jî wiha peyivî "Piştî şerawestîna di dîtîna wan de hin guherîn çêbûne. Bi desteka mezin a ku gelê Kurd dide PKK'ê dizanin. Lê ji ber ku naxwazin têkiliyên xwe û Tirkîyê xera bikin bi PKK'ê re nakevin diyalogê."

Weke tê zanîn, li ser çûna Ahmet Türk û Leyla Zana ya Amerîka, gelek guftûgo hatine kirin. Ji gelek hêlan jî rexneyên giran hatin kirin.

Hate gotin ku, der mafê Kurdistanê de hin planên Amerîkayê hene û HEP jî parçeyek ji van planan e. Serokê Giştî yê HEP'ê li ser van şîroveyan wiha axivî: "Ger Kurd nikarin xwe xelas bikin, tu kes wan xelas nake. Divê Kurd bi hêza xwe û dînamîkên xwe bawer bin. Jixwe bawer in jî. Dîtina me jî ev e. Em dê hemû pirsgerêkê xwe bigihînim dinyayê. Dê di stratejî û siyaseta tevgera Kurdî de tu tişt neguhere û Kurd têkoşîna xwe di her qadê de bidomînin. Ev tiştên ku ji hêla hin kesan ve tene gotin em qebûl nakin. Me tiştên wiha li dû xwe hiştine. Îro Kurd ji her demî bêhtir ji xwe bawer û bi biryarin. Têkiliyên ku tene danîn jî, îfadeyên vê bawerbûn û bibiryarî bûnê ne."

PKK'ê berda dewletê ew girtin

Navenda Nûçeyan- Karkerên ku ji aliyê hêza ARGK'ê ve di 26'ê Gulanê de hatibûn revandin, di 31'ê Gulanê de hatin berdan.

Karkerên ku di şirketa çêkirina rê de dixebitîn li herêma Şirnexê navçeya Banê bi livbaziyekê hatibûn revandin. Di vê livbaziye de haletên şirketê mîna minibus, teksî, dozer û

makîneyên kar hatibûn şewitandin.

Piştî bûyerê çavkaniyên gerîla dabûn xuyan ku, dê karker di demeke museit de bîne berdan.

Karkerên ku ji aliyê gerîlayên ARGK'ê ve hatin berdan, di axaftinên xwe de ji gerîlayan bi awayekî qenc behs dikirin û didan xuyan ku mua-

meleyeke baş bi wan kirine.

Ji karkeran yek jê wiha peyivî: "Em 5 şev li cem wan man. Tu xerabî me ji wan nedît. Berê em ji wan ditirsyan. Lê piştî ew qencîniyên ku bi me kirin, me dît mîna melekên in. Di propagandayên xwe de ji me re van tiştan vedigotin: "Ew riyên ku hûn çêdikin, dewlet dixwaze pê bi tanq û topên xwe ve bi ser me ve were. Dewlet çima karkeran çênake, riyên çêdike?"

Qereqola Qesrikê ji bo ku îfadeyên wan bistîne dest danîn ser wan. Piştî çûna wan a qereqolê tu agahî ji karkeran nehate standin.

Li ser pirsê der barê ku karker niha li ku ne Wezirê Karê Hundirîn İsmet Sezgin wiha axivî: "Di nava karkeran de dilxwazê PKK'ê hene."

Ev daxuyaniya Sezgin wek ku karker hatibûn girtin, hate nixxandin.



Çend ji karkerên ku ji aliyê PKK'ê ve hatibûn revandin.

HAWAR

Dilbixwîn

Û êdî gul di dilê min de vedibin!

Xwezî mamoste û şêxê me yê mezin nemir **Ehmedê Xanî** di nava vê meşa me de bûya! Bêguman wê **Mem û Zîna** xwe ji nû ve binivîsanda, lê hema bi şêweyêke din. Bêguman wê li şûna wan keserên kûr, li şûna wan nalîn, ahîn û lorîkan, wê gulên sor û zer vebûna. Xwezî gelek in, daxwaz gelek in, her yek ji me keserekê dikişîne û dibêje: "Xwezî filan heval, filan şehîd û filan dost di nava me de bûna! "Lê dîsa jî em bi vê meşa xwe re şehîdên xwe dibînin. Em bi vê meşa xwe re hemû gelê Kurdistanê dibînin. Em bi wan re dibine yek, di mirin û mayîna de em milan didin kêleka hev û li hember dijminan li ber xwe didin. Erê, tenê tiştek di mîna ez bibêjim: Gelo, ma ev roj ne ew roj e ku, ez tê de li ser dilê xwe gulên azadiyê biçînim?!"

29'ê Gulanê ye, sal 1993 ye, di nava kolanên paytexta Almaniyayê Bonnê de, em di bin ala yekîtiya xwe ya neteweyî de dimeşin. Ji min nepirsîn hûn çend kes in, bawer bikin ji sînorê hejmartinê derketiye, hema her kesê ku dibêje ez Kurd im û welatê min Kurdistan e, beşdarî meşê bûye. Ji ber zehmetiya

Xwezî di vê kêliyê de, gelê me yê li welat em dibîtana! Xwezî hinekî dîrok li xwe vejeriya û ji nava rêzên xwe hevoka "Kurd nabin yek biavêta!" Xwezî goristan biqelişiyên û miriyan bi çavên xwe bidîtana çawa bi deh hezaran Kurd bi hev re dimeşin.

derbaskirina sînor, hemwelatîyê me yê ji Skandinavya û Îngilîstanê nikaribûn werin, lê hema ew jî di vê rojê de dest bi meşa azadiyê dikin.

Xwezî di vê kêliyê de, gelê me yê li welat em bidîtana! Xwezî hinekî dîrok li xwe vejeriya û ji nava rêzên xwe hevoka "Kurd nabin yek" biavêta! Xwezî goristan biqelişiyên

û miriyan bi çavên xwe bidîtana çawa bi deh hezaran Kurd bi hev re dimeşin.

Xwezî di nava me de û li serê pêşiyê hozanê me bi taca xwe ya cewherî helbestên şoreşgerî bigotana, wê me jî hemûyan bi yek dengî lê vejeranda, mixabin gelek sal di ser de derbas bûne. Lê bawer bikin eger Şêx Ehmedê Xanî niha di nava vî karwanî de bûya, bêguman wê, wî jî bi me re ala **Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistanê (ERNK)** bilind bikira û bi dengê me rê slogana "**Bijî PKK, Bijî Kurdistan, Bijî Serxwebûn...**" bibanganda.

Belê eger Xanî zindî û sax bûya; bi vî rengî ev malik nedivîsandin:

Ger dê hebûya me ittîfaqek Vêkra bikira me inqiyadek Rom û Erebe û Ecem temami Hemyan ji me re dikir xulamî.

Ger ku hozanê me yê nemir ev ittîfaqa mezin bi xwe bidîta, wişeya "**ger**" tu caran bi kar nedianî. Lê cihê dax û mixabinê ye, berî bibîne çû ser dilovaniya xwe, cihê wî bihuşt û firdewsî nûranî be. Ev yekîtiya me serê şûrê me bilind dike, hêza me xurt dike û xewna ku tu caran kesekî bawer nedikir bibe rastî, dike rastî. Ev e Kurd bûne yek, bi hev re li ser riyekê û ji bo armancekê dimeşin. Hinek mezin, hinek biçûk, hinek xurt, hinek qels, hinek fireh, hinek teng... Bi hev re meşa azadiyê berz û bilind dikin. Bi vê meşa mezin, em şûrê di dest xwe de tûj dikin û pê serxwebûn û rûmeta xwe diparêzin. Bi rastî eger Ehmedê Xanî di bin ala ERNK'ê dimeşiya, wê ev hevok bi şêweyekî din bianiya ziman. Wê bi dîtîna, bersiva vê pirsê xwe bida:

Ez mame di hikmeta Xwedê da Kurmanc di dewleta dinê da Aya bi çi wechî mane mehrûm Bilcumle ji bo çi bûne mehkûm?(...)

Vê carê ez dikarim bibêjim, di dilê min de gul vedibin. Berê xwe didim kîjan alî, li wir dibînim, weke pêlên deryayan ala ERNK'ê xwe bi ser gelê de dihejîne. Berê xwe didim kîjan alî, li wir dayîka Kurd dibînim, wênayê Serok daye ser sînga xwe û diqêre: "**Bi te re me, bi te re me Apoyê mezin!**" Zarokên 7 salî dibînim, ji çavên wan çirûskên şoreşê difirin. Biborînin, êdî ev nivîsoka (xameya) perîşan, nizane çi bibêje...

Li Guatemala kî keysê dibîne derbeyekê dike

Li Guatemala, welatekî Amerîkaya Bakur di pêvajoya hefteyekê de yek sivil, yek jî leşkerî, du derbe çêbûn. 25'ê Gulanê derbeya sivil ji hêla Serokê Dewletê Jorge Serrano ve hatibû lidarxistin. A leşkerî jî 1'ê Hezîranê bi hevkarîya Serokê Dadgeha Qanûnê Bingehîn Epaminondas Gonzalez, Wezîrê Parastinê General Jose Garcia Samayao tertîp kir.

Nûçeyên Derve- Li Guatemala, artêşê roja 1'ê Hezîranê Serokê Dewletê Jorge Serrano ji ser kar xist û ji dil xwe ve bi banga Dadgeha Qanûnê Bingehîn, dest danî ser rêveberîya dewletê. Her çiqas rayedarên artêşê didin xuyakirin ku, ev mudexele li ser banga serokê Dadgeha Qanûnê Bingehîn hatiye kirin jî, derdorên siyasî û gelê Guatemala vê wek derbeyeke leşkerî dinirxînin.

Di nav heft rojên dawî de li Guatemala ev dibe derbeya

duyemîn ku diqewime. Wekê tê zanîn, roja 25'ê Gulanê li Guatemala ji aliyê Serokê Dewletê Jorge Serrano ve derbeyek çêbûbû. Jorge Serrano Qanûnê Bingehîn ji holê rakiribû, kongre fesh kiribû û dabû xuyakirin ku dewletê bi qerarnamayan îdare bike.

Di ser vê bûyerê re hîna hefteyek derbas nebû, vêca arteşa Guatemala bi ser derbevan Serrano ve çû da ku wî mecburî îstîfayê bike. Dawî, Serrano roja 1'ê Hezîranê îs-

tîfa kir. Wezîrê Parastinê General Jose Garcia Samayao diyar kir ku, bi ser banga Epaminondas Gonzalez, Serokê Dadgeha Qanûnê Bingehîn, Serokê Dewletê Serrano ji wezîfê hatiye dûrxistin.

Serokê Parastinê Samayao, bi van gotinan xwest ku vê mudexeleya meşrû nîşan bide. "Artêşê fermana Dadgeha Qanûnê Bingehîn anîye cih û berpîrsiyariyeke dîrokî girtiye ser xwe."

Wezîrê Parastinê gote ku Serokê Dewletê îstîfa kiriye, lê Jorge Serrano di televizyoneke Meksîkayê de daxuyakirin ku, artêşê li hember wî derbeyek li dar xistiye.

Samayao diyar kir ku, kongre wê di demeke nêzik de bicive û di şûna Serrano û alîkarê wî Gustavo Espina de serokekî nû alîkarekî Serok hilbijêre.

Li aliyê din li gor nûçeyên ajansan, Serokê Dewletê yê ketî Jorgê Serrano, piştî ku ji ser kar hate xistin reviya Amerîka.

Hate diyar kirin ku, Serrano bi malbata xwe re wek turisti reviya Amerîkayê. Artêşa

Guatemala bangî Serrano kir da ku vegere welêt.

Komeleyên demokratîk û gel bi Guatemala li hember derbeya Jorge Serrano reaksiyon nîşan dabûn, bes li hember derbeya artêşê reaksiyona wan hîn zêdetir bû.



Li Guatemala piştî ku artêşê bi derbeyekê Serokê Dewletê ji ser kar xist, li hember serhildanên gel ên muhtemel, hejmara fîmên taybetî li ber Qesra Serokatiya Dewletê hate zêdekirin

Belgrad jî tevlihev bû

Li Yûgoslavya bûyerên siyasî û civakî roj bi roj zêde dibin û pêl didin. Ji salekê zêdetir e ku li gelek herêmên girêdayî Yûgoslavya wek Bosna-Hersek, Saraybosna, Sîrbîstan û hin deverên din ji ber problemên etnîk, siyasî û civakî şerê hundirîn didome û roj namîne ku bi dehan kes nayên kuştin û birîndarkirin.

Nûçeyên Derve- Roja 2'yê Hezîranê li ser bûyera ku parlamentoyê wezîfeya Serokkomarê Yûgoslavya Dobrica Cosić ji destê wî stand, bi hezaran kes li Belgrad meşîya û serî hilda. Ev serhildana ku ji aliyê zêdeyî çar hezar kesî ve pêk hat, Belgrad tevlihev kir. Xwepêşandanên ku şeva 2'yê Hezîranê li dar ketin û veguherîn serhildanan, bi mudaxeleya polîsan bi kotek hatin sekinandin. Dema ku polîsan mudaxaleyî beşdarên xwepêşandanên kir, di navbera herdu alîyan de şer derket. Di bûyerên şerê navbera

polîs û xwepêşandanvanan de polîsek mir, 30 kes jî birîndar bûn. Piştî bûyeran, Serokê Muxalefê Vuk Drašković hate girtin.

Li gor agahiyên ajansên biyanî, xwepêşandana ku pêşî li ber avahiya parlamentoyê dest pê kir û dû re di demeke kin de veguherî serhildaneke mezin, bi bikaranîna bombeyên çavşewitandinê û berekên plastîk, hate sekinandin. Pîrr kes birîndar bûn. Ji birîndaran 3 kes polîs in, rewşa pênc birîndaran jî xedar e.

Yek ji sê polîsên birîndar li

nexweşxaneyê mir. Ajansên biyanî dan xuyakirin ku, 4 hezar xwepêşandanvanên ku li ber parlamentoyê dest bi livbaziyan kirin, pêşî camên avahiya parlamentoyê bi kevir û aletên din anîn xwar û di nav sikakan de bi bazdan belavbûn û li sikak û kolan bi sloganên wek "Belgrad serî hilde", "Edalet" protestoyên xwe domandin.

Piştî van bûyeran, di daxuyaniya ku ji aliyê polîsan ve hate belavkirin de, hate nivîsandin ku Vuk Drašković, liderê Tevgera Xwenûkirina Sîrp ku ji partiyên muxalefê ya herî tûj e û jina Vuk Drašković û çend mebus bi darê zorê xwestine bikevin nava avahiya parlamentoyê û sê polîs bi berekan birîndar kirine, ji ber vê yekê, Drašković û hevalên wî hatine girtin.

Li gor ajansan polîs, liderê Tevgera Xwenûkirina Sîrp (TXS) digirin û piştî demeke kurt wî radikîna nexweşxaneyê. Bijîşkê Servîsa Lezgîn (acîl) da

diyarkirin ku, du diranên Drašković hatine şikandin û rûyê wî hatiye reşûşî kirin.

Hate gotin ku piştî bûyeran, polîsên Yûgoslav ketin û derketina Belgradê xistine bin kontrola xwe. Di nav sikak û kolanên Belgradê de şeva 2'yê Hezîranê ta berbanga sibehê bûyerên protestoyê dom kirin, serê sibehê bûyer sekinîn.

Bûyerên şeva 2'yê Hezîranê ji xwepêşandanên 9'ê Adarê û vir ve yê herî mezin in ku li dijî Miloseviç qewimîne.

Weke tê zanîn, di 9'ê Adara 1991'î de li Belgrad, bi hezaran xwendekarên unîversîte yê muxelîf meydana Terazijeyê îşgal kiribûn, bi mudaxeleya polîsan bûyerên mezin qewimîbûn û di van bûyeran de yek jê polîs sê kes hatibûn kuştin. Tevî van mirinan bûyerên protestoyê dom kiribûn, dawî, rayedarên hikûmetê bi paş ve gav avêtibûn û midûrê polîsan ji wezîfa xwe hatibû kirin.

Wekî din bi îdiaya ku weşanên alîgir li dar dixist, wezîfa Midûrê Televîzyona Belgradê jî,



Dimenek ji xwepêşandana Belgradê

ji destê wî hatibû standin. Di dema bûyerên Terazijeyê de jî liderê TXS'ê Drašković bi birêxistina xwepêşandanên hatibû sûcdarkirin û hatibû tewqîfkirin.

Bes ji ber reaksiyonên li dijî tewqîfkirina Drašković du roj şûn ve ew serbest berdabûn.

Li aliyê din, ajans didin xuyakirin ku Serokkomarê Yûgoslavya Cosić ji ber bandora xwe ya li ser artêşê, ji wezîfê hatiye dûrxistin.

Dîsa tê gotin ku nêzîkbûna Cosić a ber bi artêşê ve Serokê Dewletê Slobadan Miloseviç tirsandiyê ku Cosić artêşê di bin bandora xwe de bihêle û li hember wî bi kar bîne, ji ber vê tirsê ew ji wezîfa serokkomariyê dûrxistiye.

Monako serxwebûnê dixwaze

Monako, dewletek ji yê biçûktirîn ên dinyayê ye. 30 hezar rûniştvanên wê hene. Mezinahiya coxrafîya wê jî 200 hektar e. Yanî Monako dewletek e, lê bi nifûs û erdê xwe wek gundekî fireh û qelebalix e.

Tevî vê yekê Monako li pey hedefekî pîrr mezin û girîng e. Ev dewlet an jî mîrîtiya ku di 1918'an de bi peymanekê bi Fransa ve hate girêdan, niha dixwaze bi her awayî azad û serbixwe be. Ji vêga ve Fransa bi daxwazên xwe qayil kiriye. Ji xeynî Fransa, Îtal-

ya, Îspanya û Amerîka jî rayeya serxwebûnê didin Monako. Niha Monako li hevalbendên din digere da ku bikaribe bibe endamê Rêxistina Yekîtiya Neteweyan. Di 21'ê Gulanê de şefê hikûmeta Monako Jacques Dupont serdaneke resmî ji bo endamiya RYN kir. Rojnamevanekî Fransîz vê serdana Monako wiha şîrov dike: "Ev mîrîti, xwe hîna bi Ewropa bi temamî nedaye pejirandin, xwe diceribîne ku dinya wê nas bike û muxetep bigire."

Di qetlîama Solîngenê de tiliya MÎT'ê

Navenda Nûçeyan- Hejmara miriyên qetlîama Solîngenê gihîşte 6'an. Yek ji birîndarên ku ji bûyerê fi-letibû, li nexweşxaneyê mir. Li gor îdfîayan ev bûyera ku li Almanya li bajarê Solîngenê pêk hat, ji aliyê Neo-Naziyan ve hatiye kirin. Weke tê zanîn, li Solîngenê xaniyekî malbata Tirk hatibû şewitandin û 5 kes li cihê bûyerê, mirovek jî vê dawiyê li nexweşxaneyê miribûn. Lê dû re, cih û dema bûyîna vê bûyerê bû sedemê hinek şikan ku, MÎT'ê ev êrîş pêk aniye. Lewre, ev bûyer beriya "Meşa Azadiya mezin" dest pê bike, bi du saetan qewimî û cihê bûyerê Solîngen, ji cihê meşê (Bonnê) tenê bi dûrahiya nîv saetê ye.

Ev yek diyar dike ku pêçiya MÎT'ê di vê qetlîamê de heye. Lewre tenê bi vî awayî dikaribûn bandora meşê ya li ser dinyayê bişkinin û rojevê biguhêrin.

Bûyera Mölnê ku 3 Tirk di xaniyekê de hatibûn şewitandin. Piştî hilibjartinên Meclîsa Neteweyî bi 3 rojan pêk hatibû. Hilibjartinên Meclîsa Neteweyî, li Ewrûpa bi beşdariya 90 hezar Kurdî ve bi serfirazî pêk

hatibû. Ev beşdariya mezin, li ser dinyayê û Tirkîyê tesîreke mezin hiştibû. Rojev bi giştî ketibû destê serokatiya Eniya Rizgariya Neteweyî ya Kurdistan û pirs-girêka Kurdî bûbû xala yekemîn. MÎT bi provakasyona Mölnê, xwest rojevê biguhêre û bandora hilibjartinê û beşdariya girseyî bişkêne.

Dîsa roja ku qetlîama li Mölnê pêk hat, dê di televîzyon Almanî ARD'ê de, bernameyekê bihata weşandin. Ev bername li ser alîkariya çekan a ku hikûmeta Alman bi Tirkîyê re dike bû. Di vê bernameyê de, li ser fabriqeya çekan a Hollandî "Eurometaal" di hate rawestandî ku ev firma gulleyên topan ên gelşikên îmal dike. Dihate diyarkirin ku hikûmeta Alman, ji vê firmayê 18 hezar gulleyên topan ên gelşikên distîne û dide Tirkîyê ku li Kurdistanê bi kar bîne.

Weke tê dîtîn, ev qetlîamên han, her dem di arîfa roj û bûyerên ku ji bo Kurdistan girîng in de, pêk tên. Ev ji diyar dike ku MÎT bi xwe, ji bo pirs-girêka Kurdî li Ewrûpa ji rojevê bixîne van provakasyonan bi kar


tîne.

Provakasyonbûna vê qetlîama Solîngenê, di protestoyên Tirkan ên li Almanya de jî eşkere bû. Nêzîkî 2 hezar kes, bi pêşengiya faşîstên Tirk, pêşî li hember kes û saziyên Almanya dest bi livbaziyan kirin. Ev kesên ku pêşengiyê dikin, bi xwe hêvotî (talîmkirî) ne û ji Hollanda ji bo pêkanîna provakasyonan hatine. Piştî


ku bi ser bûyerê ve çend roj derbas bûn, êrîşên faşîstên Tirk, berê xwe dan Kurdistan û PKK'ê. Ev grûb, di meş û xwepêşandanên xwe de, bi giştî li hember Kurdistan û PKK'ê sloganên diavêjin û Kurdistan tehdît dikin. Esnaf û xebatkarên Kurd, ji aliyê van faşîstan ve, bi faksan tene tehdît kirin. Faşîstên Tirk, di faks û telefonên ku ji Kurdistan re dikin de, wiha

dibêjin: "Tirkek mirî jî, bedelê dinyayê ye", "Ji PKK'ê re mirin", "Kurd bazirganên eroîn û berazan in", "Emê wê hemûyan geber bikin..." û hwd.

Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistanê (ERNK) jî di daxuyaniya xwe de, da xuyan ku, ev qetlîam provakasyona MÎT'ê ye û bala raya giştî kişande ser cih û dema qetlîama Solîngenê.



Xaniyê ku malbata Tirk lê dima.



Sekreterê Giştî yê Komeleya Mafên Mirovan Akin Birdal

KMM: 'Dewlet sûcdar e'

Navenda Nûçeyan- Rapora Komeleya Mafên Mirovan hate weşandin. Di raporê de rakirina Rêveberiya Taybetî (Olağanüstü Hal), pergala cerdevaniyê û timên taybetî hate xwestin.

Di Newroza 93'an de bilî Batman û Edenê li tu deveran çênebûna kuştinê bi şerrawestî û bêhnfirehbûna gel ve tê girêdan. Komele di rapora xwe de li ser hewcetiya biratiya gelê Kurd û Tirk radiweste û dide nîşan nexweşiya ku heye ji polîtîkaya dewletê ye.

Komeleya Mafên Mirovan (KMM) û gelek rêxistinên demokratîk di dema Newrozê de li bajarên Kurdistanê wek Cizîr, Dêrîk, Amed, Batman, Wan, Nisêbîn îhlalkirina mafên mirovan bi xwe dîtibûn. Komele di raporê de dewletê sûcdar dibîne û wiha rewşê îfade dike: "Li holê ge-

lek îhlalên mafên mirovan hene. Li dijî gele Kurd û nixên wî dewlet sûcdar e. Raya giştî

van tiştan dinirxîne. Raya giştî dixwaze ku qanûn ji bo kesên sûcdar jî bîn xebitandin."

Bêdadiya Wezîriya Dadiyê

Di cejna qurbanê de hevdîtina vekirî ji bo girtî û cezaxwariyên siyasî nehate kirin. Li ser vê rewşê jî girtî û cezaxwariyên siyasî demeketin hevdîtina girtî û ev çespîn protesto kirin.

Di cejna qurbanê de Wezîriya Dadiyê (edaletê) bi mebesta cejnê, mafê hevdîtina vekirî dan girtî û cezaxwariyên adli Ji vî mafî yê siyasî bêpar hiştin. Gelek malbat û lîzîmên girtî bi armanca ku dê girtî û cezaxwariyên xwe bibînin li ber deriyên girtîgehan li hev civiyan. Lê ji ber ku ev maf nedabûn ên siyasî, siyasî jî ev çespîn protesto kirin û demeketin hevdîtina girtî jî.

Li ser vê rewşê malbata û lîzîmên girtî û cezaxwariyên siyasî nerazîbûna xwe bi awayên curbucur pek anîn. Ji malbatên girtîyan yek jê wiha reaksiyona xwe anîn der. "Her cejn eynî tişt derdikeve ber me. Kesên siyasî ne canawer in, kesî naxwin. Çima ji kirina hevdîtina vekirî ewqas ditirsin?"

Hat hinbûn ku Komeleya Mafên Mirovan a Şaxê Stenbolê jî, dê di 5'ê Hezîranê de li ber Girtîgeha Bayrampaşayê li ser mafê hevdîtina vekirî daxuyaniyeke çapemeniyê bike.

Dîroka Kuba- 3

Va ye îro jî li Meksîka ye. Hê jî navê wî Ernesto Guevara bû. Navê Che (Şe) nestandibû. Leqayî Gastro hat. Ji hevdu zaf hez kirin. Tew ku bihîst Fidel dixwaze li Kubayê agirê şoreşê pêbixe, pirtir kêfxweş bû. Bi hev re dest bi planên şoreşa Kubayê kirin.

Ernesto zaf henekvan bû. Bangî kê bikira berê digot "Che" ango "hêy", an jî "Loo!"

Qastro û hevalên din navê wî kirin Che. Êdî ew bûbû Che Guevara.

Keştiya (gemiya) Granma kirin. 13 dirêjbûn û 4.5m firehbûna wê bû. Granma kevn bû. 82 mirov li Granma siwar bûn û berê xwe bi Kubayê ve kirin. Granma ava okyanûsê û pêlên gir diqelaşt. Di dîroka mirovatiyê de rûpelekî nû vedibû. Wê şerê neheqan û belengazan dest pê bikira. Sal 1956, meh Çiriya Paşîn (Mijdar) bû. Bayê hênîk jî "Siestra Maestra" dihat. Çavên Fidel li çiyên bû. Digot em bi saxî bigihîjin S. Maestra, tirs namine. Çiyayên Kubayê wê me hembêz bike û wê me biparêze.

Pêlên mezin li wan rabû. Riya xwe winda kirin. Nayê zanîn ku bi çi awayî gihîştine rêşaya Kubayê.

Gihîştin rêşayê. Çarmedorê wan hatibû girtin. Gulle bi ser wan de dibariya. Yek bi yek diketin. Hin ji wan bi gullan dimirin, hin ji wan di avê de difetisîn. Che Guevara di nivîsîna bireweriya xwe de, wilo qala vê rojê dike: "Gava em ji Granma daketin ku em biçin Siestra Maestra, hevalên min, yek bi yek dihatin kuştin. Ez doktorê komê bûm. Li hember min, li erdê du tûrik hebûn. Yek jê tijî derman, ê din tijî çek û berik bûn. Divê ku min biryar (qerar) bida. Herdu bi hev re giran bûn. Yan tûrikê derman, yan jî yê çekan! Min biryar li ser tûrikê çekan da. Û min baz da nava çiya."

Ji 82 mirovan tevî Fidel, Raul û Che 12 mirov bi saxî digihîjin Siestra Maestra. Nizanan li ku ne. Li wan dibe sibeh, ji gundiyeke dipirsin: "Em li ku ne?" Gundî, kurtebir dibêje: "Siestra Maestra". Qastro kumê xwe davêje banî û dibêje: "Em jî, Kuba jî xelas bû!"

Diktator Batista li dinê belav dike ku, Qastro û hevalên wî hemû hatine kuştin.

Pişî çend rojan Qastro, dişîne pêy rojnamevanan. Sûretê Qastro di rojnameyê de bi çek tê çapkirin. Xof û tirsê dilê Batista mezin dibe. Ew xof ji xwe tu caran jî dilê wî nayê der. Ta ku di 1'ê Çileyê 1959'an de Qastro bi milyonan dikeve bajarê Hawana û Batista direve der.

Berî Fidel û Che bi şêst salî hevalên Jose Martí yên şoreşger û ronakbîr jî, ji Domînik tîr Kubayê. Destpêka şerê J. Martí û Qastro dişibe hevdu. Bes di dawîya şerê J. Martí de "Artêşa Rizgarî" belav dibe. Endamên wê yan tene kuştin, yan jî tene girtin.

Gerilayên Qastro bi ser dikevin. Tariya li Kubayê belav dîkin, ronahiyê tînin.

Sal 1961 e. Helbestvanê Tirkî Nazim Hikmet li sirgûnê ye. Diçe Kuba. "Hevpeyvîna Hawana" dinivîsîne. Nazim wiha dibêje:

Fidel jî di nava wan de, ji 82'yan

12 sax mabûn.

Fidel jî di nava wan de 12 kes bûn

di Çiriya Paşîn ya 56'an de.

Fidel jî di nava wan de, 150 kes bûn

di Çileyê Paşîn ya 56'an de.

Fidel jî di nava wan de 500 kes bûn

di Sibata 57'an de.

Fidel jî di nava wan de, bûn 1000.

Fidel jî di nava wan de yek milyon,

sed milyon.

Hemû jî bo mirovati, hilweşandin Batista

di Çileyê 959'an de.

Û artêşa 50 hezar û milyonerên levenê şekir. Û yên biçih û yên Yankê û leşkergêhên laşên mirovan ku li ber rîzyayî. Û ticarên eroînê û qumarxaneyan û nûnerê Amerîkayî Yekbûyî û leşkerên Amerîkaya Yekbûyî yên banî, bahrî û reşayî. Û dolarên Amerîkaya Yekbûyî...

Di 1'ê Çileyê 1959'an de, di berbanga sibehê de gerilayên Kubayê xelata azadiyê û serfiraziyê da gelê Kubayê. Ev xelata sersalê bû.



Kubayî ji fîesta, ji sîesta û ji Fîdel hez dîkin

Osman Özçelik

Min bibexşînin di sê hejmaran de destên min ji Meydana Şoreşê ya Hawanayê nebû. Bêşik Kuba, ne bes Yekê Gulanê ye û ne Meydana Şoreşê ye. Rewneqîya Yekê Gulanê ez bi wir ve girê dam.

Ka hûn dixwazin em bimeşin, dakevin nava bajêr. Weke min, Nazim Alpmann û K. Gökhan Gürses, soleke sivik a meşê di lingê xwe bikin, kurtikekî caw pembû bikîşînin ser canê tazî û em xwe berdî nava kuçên Hawanayê.

Bêhnêk giran heye li Kubayê. Nizanim bêhna gazê ye, bêhna kukurdê, yan jî bêhna eraq a "Ron"ê. Ron, ji levenê şekir pêk tê. Û Ron li Kubayê weke avê diherike.

Ron, cemed, ava leymûnê û piçek şekir bi hev re dibe "mohîto". Tew ta ka nanê teze di nav bikeve, dibe vexwarineke herî hêja. Kubayî Ron û mohîtoyê bi tu tiştî nadin.

Germî li dora 40 santîgratî ye. Ne ji bayê oqyanûsê be li Kubayê jîyan çetîn e.

Li kuçan zarok beyzboll dileyîzin. Komek keçikên biçûk li hev civiyane stranên dibêjin û pê re dileyîzin. Ji wan yek muzirtîyan dike û yên din bi ken û henek tepikên biçûk lê didin. Paşê bi destên hevdu digirin û bi reqs, stranên xwe didomînin. Dê û bavên wan di binê siyekê de li wan mêze û gale galan dîkin.

Jinek reşik bi mêrê xwe yî spî û kurê xwe yî reş ve dimeşin.

Mînbusek dibistana biçûkan tijî zarok e. Cilên wan î taybetî, şuştî û pak in. Di mînbusek de dileyîzin. Mamoste pirtûkek di dest de ye. Yek caran difetile ser wan û şîretan li wan dike. Em benîşt li wan belav dîkin. Wênayên wan dikîşînin. Zarok pîr kêfxweş dibin. Mamoste dibêje: "Spas bikin!" Reş û spî, keç û law zarok spasîyê didin me.

Xortek bi bisîqlête bi me re dimeşe. Devliken e. Dixwaze dostaniyê bi me "turîstan" re deyne. Bes bêfeyde ye. Em bi zîmanê hevdu nizanin.

Xortekî reşik xwe diloqîne (diqurêfe) û dimeşe. Benîşt dicû, bi çavêkî melûl li me dinêre. Me ji hev re got: "Nêremoyê dinê hemû mîna hev in."

Ber êvarê ye, şênî zêde dibin. Li rexê oqyanûsê êdî Ron vedixwin. Bisîqlêt pirtir dibin. Keç xwe qenc li nava xortan (bi destan) girê didin. Serê xwe didin ser piştên wan. Weke dixwazin lîxistina dilê hevalên xwe bibihîzin.

Kalemêr û pîrejinek rûniştine çixarê dikîşînin. Em westiyane. Me silav da wan û em li nik wan li piyê behrê rûniştin. Ji me pirsîn. Me got: "Em dostên Kubayê ne, ji Tirkîye". Rûyên wan nerm bû, çavên wan çirûsî. Çixare kerem kirin. Me jî heste diyarî wan kir.

Reşayî kete erdê. Ji kuçan dengê gitar û stranên Îspanyolî bilind bûn. Stranên Behra Spî. Stranên nerm û bi şewat. Keç û xortan li sikakan dest bi dansê kirin. Weke yeqîn in ku wê bigihîjin firehiyê. Bav û kalên wan gelek rojtengî derbas kiribûn ji Efrîqa nolî heywanên biyanî bi hikmê zorê anîbûn vê giravê. Îro sefiraz in. Luks tune be jî dibe. Ji ber vê yekê şoreşê diparêzin.

Li her taxê ala 26'ê Tîrmehê bi rengê sor û reş li ba dibe, pêl dide. 26'ê Tîrmehê destpêka şoreşê ye. Li her taxê, Comîtes de Defansa de la Revolucion (Komîteya Parastina Şoreşê) heye.

1. Confederacion de Trabajadores de Cuba (Konfederasyona Karkerên Kubayê)

2. Federacion de Mujeres Cubanas (Federasyona Jinên Kubayî)

3. Comîtes de Defansa de la Revolucion (Komîteyên Parastina Şoreşê)

4. Union de Juventud Comunista (Yekîtiya Ciwanên Komunîst)

5. Federacion Estudiantil Universtaria (Federasyona Xwendevanên Zanîngehan)

Di aborî û rêvebirya Kubayê de ev rêxistinên sîvil cihêkî zehf girîng digirin. Em bibêjin siyaseta Kubayê di destên van rêxistinan de ye, ne derew e.

Parastina şoreşê, pêşvebirina sosyalîzmê, parastina wekhevîyê, belavkirina hebûnê, zêdekirina ber, hemû tişt di dest wan de ye.

Demoqrasi ya sosyalîst li her derê dixuyê. Em li gera xwe yî kuçan vegezin. Xuyaye turîst li Kubayê kêr in. Kî me dibîne dixwaze qenciyeke bi me bike. Gava ku tarî dikeve erdê, dest û

ling tê kêşan û şev derbas dibe, şênîyên kuçan tene guhertin. Û em rûçikê Kubayê yê din dibînin.

Êdî mirovên ku li kuçan xuyan dibin, xortên kurtik hevirimîşî û keçên sîng vekirî, lêv sorkirî û kirasqut in. Keçikên ciwan, xweşik û pak. Dikenin, ken ji rûyê Kubayîyan kêr nabe. Gava ku tu dibêji, "Ez naxwazim" dev ji te berdidin, bi ken dibêjin: "Şev baş" û diçin.

Hevalên min ecêbmayî man. Gotin: "Li vir jî ev şixull!" Min got: "Ev şixul, şixulê jîne yê kevn e; ev şixul tune be jîn xweş nabe. Li Mekke û Medîne jî ev şixul heye. Ku tunebûya divêt hûn ecêbmayî bimana."

Me xwe ji wan xelas kir. Em ketin "Otel Plaza", li wir hunermendên xweşawaz muzîka Îspanyolî pêşkêşî me kirin û me bi wan re dans kir.

Kubayî ji "Fiesta" û ji "Siesta" hez dîkin. Fiesta; Muzîk, dans û kêf e. Siesta jî; Xewa nîvro ye. Kubayî heta saet 14.00'an dixebitin. Bi roj sê çar saetan xew dîkin û heta nivê şevê vedixwin û dans dîkin.

Em li meyxaneya ku Che û Ernest Hemîngway lê vedixwarin rûniştine. Esvaldo ji me re mohîto û goştê birajî tîne. Ji Brezîlya, Şîlî, Avusturya, Kanada mêvanên meyxaneyê hene.

Wênayê Che di quncê berbiçav de cih girtiye. Diwarên meyxaneyê bi nivîsên mevanan tijî ne.

Em li Otel Îtobo ne. Lares Trenjan tê serlêdana min. Lares qala xwe û Che dike. Lares a heftê salî. Lares dibêje "Ez ji Kurdan û têkoşîna wan hez dikim." Lares muzîka Kurdî dinase û melodîyeke Kurdî ji min re, bi notayê dinivîse û bi deng dike. Laresa çerm-sor, Kubayîyên rûken û germ. Kuba, em wê li dû xwe dihêlin.

Şorên (peyvên) kompanyêro (hevalo) û kompanyêra (hevalê) di guhên me di dimîne. Em kuba dispêrin dîrokê û em berê xwe didin mala xwe

Çavkanî:

1. Devrimler Tarihi Ansiklopedisi cilt 1
2. Meydan Larousse
3. Havana Güncesi: Yalçın Doğan (Cumhuriyet Nisan 79)
4. Milliyet Büyük Dünya Atlası
5. Ferheng-İzoli (Weşanên Deng)



Hînbûn ronîya çavan e!

Gotinên Pêşiyên Kurdan

Di dema me de Mêdî û Deccal

Hz. Muhammed digot: "Wê demek bê, wê Deccal û Mêdî rabîn. Heçî Deccal bêol û bêîman e. Ji xerabiyê û pîsîtiyê pê ve tu karî nake. Di dema Mêdî de jî, wê gur û mîh bi hev re biçêrin. Ango di dinê de neyarî namîne û mirov dibin wek xwişk û birayên hev."

Di dema me de Deccal jî derketiye û Mêdî jî rabûye. Gur jî heye, mîh jî heye. Deccal kî ye, Mêdî kî ye, gur kî ye, mîh kî ye?

Hz. Muhammed dibêje: "Deccal bêdîn û bêîman e û gelekî dewlemend e, çî bixwaze kare wî bike. Ji bo ku gelê feqîr û perîşan bixapîne, bike hevkarê xwe û wan bêdîn û bêîman bike. Li gundan û li bajarên digere, gelê ku dinê wî, îmana wî û vîna wî (îrade) qewîn be, dibêje: "Ev Deccal gunehkar e, nerin ba wî" û her kes Deccal nas dike û xwe jê diparêze. Ên ku diçin balê, Deccal dibêje: "Hûn hewceyî çî ne? Ji min re bibêjin, ez bidim. Xwedê tune, Xwedê ez im." Ên ku baweriya wî pê were û bibe hevkarê wî, tiştê ku ji malê dinyayê jê re pêwîst be, didê û dibêje, "Te dît ku min çawa xwestina te anî cih. De ka ji Xwedê bixwaze, ji te re dikare tiştêkî peyda bike?"

Ên ku baweriya wan pê nayên, li hember wî radibin, dibêjin: "Tu Deccal î, tu gunehkar î!" Deccalê gunehkar radibe malê wan û zadê wan giş dişewitîne. Bi mehan, bi salan wan

birçî dihêle û hewceyî xwê dike. Dîsa ji wan re dibêje: "Hûnê jî birçîbûnan bimirin, bibin hevalê min." Ew kesê ku îman û vîna wan qewîn be dibêjin: "Na tu Deccal î, gunehkar î." Ew Deccalê gunehkar ji celadê xwe re dibêje van biavêjin cehnemê" û celad wan kesan dikujin. Ên ku dike bin çava, ên ku nefî dike. Wan feqîr û bêmecal dike, ji bo ku wan hewceyî xwe bike û bi xwe re bike hevkar, ol (dîn) û baweriya wan bi avê de berde... "Ew gotinên Hz. Muhammed, di dema me de hemû li Kurdistanê tên kirin û li ber çavan e.

Di dema îro de serbazek dagirker ku diçe gundan, ên ku pê re nebin hevkar mala wan û qûtê wan dişewitîne, hinan jî bi celadê xwe dide kuştin. Ên ku dike bin çavan, hingavtinê bi wan dike. Ji wan re dibêje: "Qedera we di destê min de ye, Rebê we ez im." Ên ku wek wan cerdevanê bêdîn û bêbawerî bin, serbazê dagirkeran re dibin hevkar, pere û tiştan ji wan distînin.

Di vê demê de dewlemendên dinyayê çî bixwazin karin peyde bikin. Wek dema qral û firewna ku gelê azad û feqîr dixistin, bêmecal dikirin û dikirin deyndarê xwe digotin: "Hûnê an deynê xwe bidin, an jî hûnê bibin koleyê min." Wan kesê feqîr nikaribûn deynê xwe bidin. Bêçare diman û ji wan re dibûn kole. Ji wan re digotin, heywanê du pê, dewlemendê

vê demê jî em dinêrin karker, gundî û kedkaran feqîr dixînin û wan dikin deyndarê xwe û wan hewceyî xwe dikin û wan bêmecal dikin û wek kolan ji xwe re dixebitînin. Ked û xwîna wan kesê feqîr dimijin, ew kedxwar. Gurên har in. Di vê demê de jî, ew kesên mecâl û bêçare mîna mîhan in. Ku gur li wan çî bike jî, nikarin xwe biparêzin.

Ez îro bawer dikim ku, dema mîh û gur tev biçêrin nêzik bûye û Mêdî jî derketiye.

Hz. Muhammed digot: "Wê Mêdî ji aliyê Rojhilat rabe", Rojhilat jî neteweya Kurdistanê ye û behsa çemê Feradê jî dikir...

Piştî Hz. Muhammed û vir ve, tu gel û sazûmanan doza wekheviya gelê dinê nekiriye. Îro em dinêrin Partiya Karkerên Kurdistanê û serokê wê û Kurdên welatparêz û pêşverû dixwazin gur û mîh tevde biçêrin û neyarî di dinyayê de nemîne. Ê her kes wekhev û wek bira bin. Ew kesên xizan û perîşan ku malê wan û qûtê wan dişewitînin, wan nefî dikin, ew kesê ku li hember kedxwar û dagirkeran li ber xwe didin û xwîna xwe dirijînin, ew leşkerê Mêdî ne ku, serokatiyê ji wan leşkeran re dike û rîya rastiye şanî wan dide ew jî Mêdî ye. Xwedê nesibê we gişa di dema Mêdî û cinetê de bike û însalah jî hûn gişt jî buhiştî ne.

**Mele Xelîl Kurt
Girtîgeha Aydin**

TÎR

Musa Anter



Tekoşîna dirêj û Apê Mûsa

Di roka têkoşîna neteweya Kurd gelek dirêj e. Dem hatiye têkoşîn bilind bûye, gel ketiye nav şer. Dema şer şikiyaye, dewleta Tirk ferman daye ku, Kurdên bikevin destên wan bikujin û sirgûn bikin. Ê her dem burjûwaziya Tirk, xençera xwe ya herî tûj li rewşenbîrên Kurd xistiye.

Bêguman, rewşenbîrên Kurd li gor demê rolek hem negatîv û hem jî pozîtîv lîstine. (Nirxandina rewşa rewşenbîrên Kurd li derveyê vî nivîsê ye) Lê tiştê diyar e ku, dewleta Tirk rewşenbîrên Kurd, di dema aştiyê (!) de jî, tu car rehet nehîştîye. Ew her dem di bin çavên polîs de bûne; hatine girtin, sirgûn bûne, ew dane dadgehên faşîst û nijadperest, ji kar hatine avêtinê. Bi her awayî, ew jiyanek gelek bi zehmet kişandine.

Di ser de jî, her ku cunta leşkerî hatiye ser hikûm, ew di cih de rewşenbîrên Kurd civandine û avêtine zindanan.

Apê Mûsa di diroka têkoşîna rewşenbîrên Kurd de cihekî dirêj girtiye. Dem hatiye karê xwe betal kiriye û bêhna xwe ya dirêj daye. Lê car din neketiye bêçaretîyê. Hêviya wî bi gelê wî re û bi têkoşîna wî hebûye.

Bi deh salan hepis dane wan. Wek tê zanîn, bi deh salan e tu caran rewşenbîrên Kurd ji pêşiya xwe emîn nebûne. Di yek cihekî de heta dawî nikaribûne kar berdewam bikin. Di bajarên xwe de nikaribûne bisekinin, ge-

lek caran koçber bûne. Di mala xwe de nikaribûne rehet rakevin. Her tim di nava heyecan û tirsê de bûne.

Di vî têkoşîna neteweyî ya dirêj de Apê Mûsa, ji van jan û stembariyan para xwe zêdetir girtiye. Jiyanê xwe li gor têkoşîneke dirêj saz kiriye. Wî her dem zanibûye ku, dema zor jî heye û dema fireh jî heye.

Hinek qal dikirin, di dema 12'ê Adara 1971'yan de, hêzên cuntaya leşkerî tene mala Apê Mûsa û jê dixwazin ku, ew bi wan re heta îstasyona polîs here (!) Apê Mûsa wan dide sekinandinê û dest bi haziriya xwe dike; bahola xwe datîne, kinc, pêjgir û hwd. dike navê werhasil her tiştên xwe bi xwe re dibe. Ji ber ku, zanibûye î birina wî tenê ne ji bo îfadan e, wê demeke dirêj di zindanê de bimîne.

Apê Mûsa di diroka têkoşîna rewşenbîrên Kurd de cihekî dirêj girtiye. Dem hatiye karê xwe betal kiriye û bêhna xwe ya dirêj daye. Lê car din neketiye bêçaretîyê. Hêviya wî bi gelê wî re û bi têkoşîna wî hebûye.

Dema PKK'ê di 1984'an de dest bi şerê çekdarî kir û diyar bû ku wê şer dom bike, mûyên laşê Apê Mûsa car din gij bûn. Ew wek rewşenbîrekî reformîst û oportunist li dijî vî şerî nesekinî. Dema M. Alî Bîrand ji bo sehkîrinê li Kurdistanê geriya, ka welatparêzên Kurd ji bo şerê çekdarî çî dibêjin! Wê demê wî birîna dilê xwe teze kiribû. Paşê M. Alî Bîrand biranînên xwe nivîsand û got, ku hinek welatparêzên kevn ji bo şer wiha bibêjin: "Tiştên ku me dixwest em bikin, niha PKK dike. Em nikaribûn bikin, em çîma li dij derkevin." Min dema ev xwend, min texmîn kir ku ev rewşa Apê Mûsa dide diyarkirinê.

Herê Apê Mûsa, dema PKK'ê xewna Kurdên welatparêz kire rastiya jiyanê, beriya gelek rewşenbîrên Kurd, te wê pêşveçûnê dît û rewşa xwe zelal kir. Lê hê jî ez tenegehîştîm ka tu bi çî awayî ewqas aktîf û jêhatî bûyî? Ew çî enerjî û çî zanatî bû? Tu dibê qey Apê Mûsa te xwe bi salan tîjî kir û bi carekî ve li ser rûyê dewleta Tirk vereşiyayî! Kêm kes bi qasî te karmend, general û serokên dewleta Tirk ewqas zêde deqmirî (eciz) kiriye. Lewma reaksiyona wan ewqas bi hovîti hate ser te. Xwezî bi canê te Apê Mûsa!

Bawer Pîroz / Stockholm

Jûjî...

Doğan Güzel



MEŞA AZADIYÊ YA MEZIN

Dilbixwîn

120.000 Kurd ji bo azadî û yekîtiya neteweyî meşiyar!

Di dîroka Kurdistanê de, Bonn ji dibe bajarekî serhildanê! Di meşa azadiya mezin de Kurd bûne yek

Di meşa azadiya mezin de Kurd bûne yek

Bonn xwe bi kesk û sor û zera Kurdan dixemilîne!

Roja 29'ê Gulana 1993'yan li Almanya, li bajarê Bonnê ji bo azadî û yekîtiya neteweyî bêhtir 120.000 hemwelatîyên Kurd meşiyar. Ev meşa dîrokî ji hêla van partî û rêxistinên ve hatibû organîzekirin: **PKK, PSK, PDK-HEVGIRTIN, YEKBÛN, RNK (KUK), TSK, PRK (Rizgarî) û KAWA**. Li kêleka welatparêzên Kurd gelek dostên tevgera rizgariya neteweya Kurdistanê jî parlamenter, polîtîkvan, pisporên komeleyên mafên mirovan, profesor û nûnerên saziyên navneteweyî, ji bo piştgiriyê beşdarî meşê bûn.

MEŞ DEST PÊ DIKE

Ji vir yekîtiya gelê Kurd a dîrokî dest pê dike. Ji vir mêjû rûpelekê nû vedike û bi tipên girs dinivîsîne: "Gelê Kurd dibe yek. Ji bo azadiyê Kurd bi hev re dimeşin."

Bi sedan otobus, otomobîlan Kurd hilgirtibûn û berê xwe dabûne Bonnê. Ji gelek deverên dûr hatibûn, lewma ji 28'ê Gulanê ve bi rê ketibûn, xew nedihate çavên kesekî, weke ku biçine dawetekê, Kurdan kincên xwe yên neteweyî li xwe kiribûn. Hinek bi şal û şapikan, hinek jî bi şarwar û şûtikan, serê her kesî bilind bû, çavên wan hêstirên şahiyê, serfiraziyê dibarandin. Li ser her zimanî slogana: "**Bijî Yekîti, Bijî serxwebûn, Bijî Se-**

rok Apo!" hebû.

Meş di bin alên azadiyê de, saet di 12.00 de dest pê kir. Karwanekî gelekî dirêj bû. Ji ber tengbûna cih meşê bi sê ji hêlan ve dest pê kir. Bi rastî jî, ji bo hejmareke wisa bilind Bonn bajarê gelekî biçûk e. Tevî vê yekê jî, seriyê her karwanekî hebû dawîya wî tune bû.

Bi hezaran kîlometran dûrî Botanê ye, lê bi vê serhildana gelê Bonn weke Botanê bi alên serxwebûn û azadiyê yên rengîn xwe dixemilîne. Li wir çiya, sloganên şoreşê li hev vedigerînin, li vir kolan û taxên Bonnê van sloganan: "**Bijî Serok Apo!**", "**Gerila lédixê, Kurdistanê ava dike!**", "**Bijî Yekîtiya Neteweyî!**" digihînin guhên mirovahiyê. Bila cihan bibihîze û bibîne, eger mirovperwerî hebe jî dê dengê gelê Kurd bibihîze. Kurd jî weke her neteweyekê, azadiya xwe dixwazin. Ne şer ne jî xwînrijandin, berî her tiştî Kurd serbestî û rizgariyê dixwazin. Vê meşa mezin ev rastî û daxwazê dianîn ziman.

Dema ku mirov carekê li ve meşê dimezîne, bi rastî lerzîn dikeve can û bedenên. Heyecanê mezin xwe daye gel. Banga azadiyê ya 120.000 Kurd ne hindik e.

Û meşê dest pê kir! Li pêşiya karwanê azadiyê posterê Sekreterê Giştî yê PKK'ê **Abdullah Öcalan** ji hêla 20 ciwanê Kurd ve hatibû hilgirtin. Li pey alên **PKK, ERNK, ARGK** ku bi hezaran bû, nedihatî hejmartin pêl didan, ji bo serxwebûnê bixêrhatina heval, dost û hogiran dikirin, silavên şehîd û şoreşgeran ji meşa azadiyê re anîbûn. Di rêza duymîn de paqarta **PSK** û alîgirên wê dimeşiyar. Her wiha rêzan heya dawiyê dom dikir. Dîsîplîna meşê bala her kesî dikişandê ser xwe. Kesekî bawer nedikir ku, ev meş bi silametî dest pê bike û biqedê, lê bi biratî û hevaltîyeke pirr xurt meş bi rê ve



Zêdeyî 100 hezarî Kurd, di bin alên ERNK'ê û wêneyên Abdullah Öcalan de, dengê doza serxwebûna Kurdî gihandin dinyayê.

çû.

Heya saet 17.30'yan livbaziye dom kir. Westabûn tune bû, heya dawiyê gel bi heyecan bû. Gihiştin meydana. Programê dest pê kir. Bi sê zimanên Kurdî, Tirkî û Almanî.

Serokê PKK Abdullah Öcalan ji bo meşê mesaja xwe hinartibû. Dema ku mesaj hate xwendin. Lingên gel erd nedigirtin, firiyan, sloganan xwe gihandine ezmanan, tu nemabû ku gel hev bixwe. Bi rastî jî ne hindik e 120.000 kes bi yek dengî bi hev re slogana "**Bijî Serok Apo!**" biavêje. Serokatiya PKK'ê di mesaja xwe de li ser mezinbûna şerê azadiyê, şerawestîne, yekîtiya neteweyî, avakirina eniya neteweyî û livbaziya Çepekkûrê (Bîngolê) ya vê dawiyê disekinî. "Dewleta Tirk dixwaze biryara teslîmîyetê li ser me bimeşîne. Me ji bo teslîmbûnê biryara şerawestîne nestandîye. Em ji berê xurttir û mezintir in. Bila dewleta

Tirk tu caran nefikire ku em teslîm bûne. Ji hêlekê ve werin teslîm bibin, ji hêla din ve jî bi hezaran leşkeran derdixê operasyonê, vê planê li dijî me dimeşîne. Aştî bi vî awayî nabe... Ev livbaziya Çepekkûrê jî bersiva êrişên wan e, mafê me heye em xwe biparêzin..." digot

Programa meşê giraniya xwe dabû ser axaftin, mesaj û bixêrhatina mêvanan. Lê dîsa jî du hozan bi stranên xwe şahiya di nava gel de germ kirin. Hozan Seîd Gebarî û Hozan Beser Şahîn ji Koma Çiya bi stranên xwe tevî meşê bûbûn.

Piştî xwendina mesaja Abdullah Öcalan, a PSK'ê hate xwendin. Her wiha axaftinê rêxistinê ku meş organîze kirine, hatin xwendin. Bi vê yekîtiyê gel kêfxweş û dilgêş bû.

Weke dibêjin "Dayîkan zarok avêtin" dinya bûbû erdê eresatê. Yekî yek winda bikira hew dikaribû bidîta, Ji bo **Welat** bi çend


kesan re min axaftin çêkir. Her kesî wiha digot: "Kî dikare bibêje Kurd nabin yek?! Kurdistan rizgar bû, dilanê bigirin, zimneyê binin, bililînin..." Pîrejînekê ku ji gundekî Fransayê hatibû, wiha gote min: "Di rojnameya xwe de binivîsinin, di meşa şerefê de Kurd bûne yek. Bi xwîna Mazlûm û Egîdan Kurd bûne yek, bi rêberiya Serok Apo Kurd bûne yek!..."

Gel di serhildaneke mezin de bû. Li jor kameramanê TV-Cûdî (Berlîn) di helikopterekê de ev serhildan dikişandê ser vîdyoyê. Li jêr bi dehan kameramanên Kurd, Tirk, Ewrûpî li hev diqelîbîn.

Alman lê ecêbmayî diman, çawa evqas Kurd dikaribin bi hev re bimeşin, ne tenê Alman, Kurd bi vê yekîtiyê matmayî diman. Bi rastî êdî layîq e em nav li vê meydana bikin Meydana Azadiyê, ji ber ku ji bo azadiyê evqas Kurd bi hev re dimeşin.



Kolan û kuçeyên Bonnê lêrî zêdeyî sed hezar Kurdî nekirin.



Di meşê de alîgirên ERNK'ê yên Alman jî, cih girtibûn.

MESAJÊN JI BO MEŞÊ HATINE PÊŞKÊSKIRIN

Abdullah Öcalan (Sekreterê Giştî yê PKK'ê), Kemal Burkay (Sekreterê Giştî yê PSK'ê), Hemreş Reşo (PDK-HEVGIRTIN), Serokê Belediya Hannoverê, Heidi Alm Merck (Wezîra Dadmendiye ya Saksonya Jêrîn), PASOK (Partiya Sosyalîst a Yewnanîstanê), Akin Bîrdal (Serokê KMM), YNK, Partiya Şoreşê ya Tirkîyê, TKP-Kivîcim, Partiya Keskan a Eyaleta Bakura Ren Westfalya, PDS (Almanya), Herbert Schmalstieg (Parlamentere SPD'ê), Prof. Hannes Duchtig, Tevgera Azadî û Aştiyê (Fransa), CFDT (Sendîqaya Karkeran), Serokê Belediya Moulousê...

Di meşê de Parlamentere **Amedê** Hatîp Dicle û xwediyê rojnameya **Özgür Gündemê**, nivîskarê **Welat** Yaşar Kaya ji axaftin pêşkêş kirin. Di axaftinên xwe de daxwaza Kurdan a aşî û azadiyê anîn ziman. Her wiha bi navê Medico International, parlamenterekî Swîsre (Îsvîçre) û Danîmarka ji axaftin pêşkêş kirin, di nava axaftina wan de sloganên weke: "Bijî internasyonalîzm!" hatine avêtin.

Li dawîya meşê, li vegeerê min ji hevaleyê li ser xwarinê pirsî: "Çiqas goşt hate firotin?" Bersiva min da û got: "3500 kg, her wiha borek, lehmeçûn, çay, qehwe..." Gotina xwe bi kenekî sivik û hevokê wiha qedand: "Me av bi Bonnê ve nehişt, tî nemînin baş e!" Hevalê li kêleka min deng bi xwe xist û got: "Tî namînin, lê we birçî bimînin..."

Weke ku hatin xweş û bi heycan bû, çûyîn ji xwestir û bi heyecantir bû. Karwanê azadiyê kom bi kom dîsa berê xwe dane otobusan, vedigeriyane malên xwe. Di dilê wan de ala serxwebûn û azadiyê pêl dida.

Giyana Yekîtiya Neteweyî Bonn hejand

Nîhat Dirêj

Di 29'ê Gulana 1993'yan de li paytexta Almanya Bonnê di bin navê "Meşa Azadiya Mezin" de zêdeyî sed hezar Kurd meşîyan. Bonnê, ji rojek ji rojên me yê dîrokî re şahidî kir. Di dîroka Kurdistanê de cara yekemîn e ku, biratiya Kurd û Kurdan pêk tê. Gelê Kurd bendewarê hesreta vê rojê bû. Ji şehîdên Kurdistanê re, ji Serokatiya Neteweyî re û ji gerîla re mînetardar im ku vê rojê nişanî me dan. Di pêvajoya yekbûna neteweyî de, ez li hemû hêz, kom, sazî, nivîskar û şexsiyetên Kurdistanê, ji bo gavavêtina wan a ber bi yekbûna gelê Kurd ve, silav û pîrozbahî dikim.

Dîrok wê roja 29'ê Gulana 1993'yan ji bîr neke... Wek Meşa Brukselê, Festîwala Bochumê, Grewa Bîrçibûna Parlamentere Kurdistanê li Belçîqayê... Yek ji yekî serfiraztir, dewlemendtir, bilindtir...

Roja 29'ê Gulanê, dawîya Heftiya Şehîdên Kurdistanê, bajarê Bonnê ji Kurdistanîyan re teng hat. Ji ber vê yekê meş, di sê milan de bi deh hezaran dest pê kir. Di meydana navçeya Bonnê de qefle bi qefle gihîştin hev... Bû sed hezar gulên sor û di navçeya Bonnê de vekirin. Zêdeyî sed hezarî dil, zêdeyî sed hezarî deng li dinê banga doza mirovatîyê kirin. Kurdên li Ewropa, bi vê livbaziya mezin 30 milyon gelê Kurdistanê bi layiqî nûnerandin. Ji bo mafên neteweyî, ji bo azadi-

ya Kurdistanê, biryariyên xwe ji raya giştî ya dinê re, ji dewletên dinê re îlan kirin. Gelek hêz, partî, saziyên navneteweyî û hêzên çepên Tirk beşdarî meşê bûn. Piştgirî dan **"Meşa Azadiya Mezin"**. Ji nava gelek mêvanên biyanî, çend axaftvan, çend parlamentere Ewropî di axaftinên xwe de xwînrîjî û qetlîamên komara Tirk protesto kirin. Piştgirî dan biryara şerrawestina PKK'ê û yekîtiya neteweyî ya Kurdistanê. Di nav mêvanên ji welat hatibûn de, Parlamentere HEP'ê yê Diyarbekir **Hatîp Dicle** û Serokê Giştî yê DEP'ê **Yaşar Kaya** li ser pirsgerêka rojane rawestîyan. Bangên girîng li parlamento û dewletên dinê kirin. Axaftina Dicle û Kaya bi baleke hêja hat guhdarîkirin. Komita Meşê ji pîrriya mesajan, xwendina wan mimkûn nedît.

Komîteya Meşê, bi giraniya ERNK'ê (Beşa Ewropa), ji hemû hêz, grubê Kurdistanê Bakur-lî Ewropa, hatibû damezrandin. Ev livbaziya han î mezin ji destpêkê heta dawiyê bi organîzasyonê baş meşîya. Ji sed hezarî zêdetir kes, di nav disîplîneke giştî de hemû biryarên Komîte anîn cih. Lê mixabin axaftina Kurdî ku bi navê Komîteya Meşê hate kirin zêde zelal û baş nebû. Ji bo qeyidkirina vê meşa dîrokî, qamerayên jêr qîm nekirin. Qomîteyê, bi helîqopter pêlên meşê li jor hilda qamerayê. Du helîqopterên Almanî ji li ser meydana meşê doç dibûn.



Di meşa Bonnê de, dayikên Kurd mizgîniya yekîtiya gelê Kurd îlandin.

Gava programa meşê bi marşa **Ey Reqîp** dest pê kir, bi deh hezaran alên neteweyî rabûn jor, li ba bûn. Ji sed hezarî zêdetir kes, li hizûra şehîdên Kurdistanê ketin rêzdariyê; çav ji hêstiran tije bûn... Wek Yaşar Kaya di axaftina xwe de digot çokên mirov dilezîzin...

Beriya her tiştî pêwîst e ku em meşa Bonnê bi encamên wê yê siyasî re binirxînin. Biryara şerrawestina PKK'ê ji gelê Kurd re pêvajoya yekîtiya neteweyî ya Kurdistanê xelat kir. Di vê pêvajoyê de, demên nû li pey hev vedibin. Daxuyaniyên dîrokî hevdu taqîb dikin. Dem dilezîne. Li ber vê lezê hişê mirov diçe... Bar hîn giran dibe. Protokola yekîtiya neteweyî, rejîma Tirk bi îsrareke mezin dawetî hevdîtina pirsgerêka Kurdistanê dike. Hetta **Sekreterê Giştî yê PKK'ê A. Öcalan** ji li berpîrsiyarê artêşa komara Tirk banga hevdîtina şerrawestîne kir. Deriyê aşî û biratiyê ji aliyê Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistanê ve, hetanî dawiyê hetiyê vekirin. Komara Tirk çi dike? Bi hemû hêzên xwe yê çekdar ve xwînrîjîyê dom dike! Qetlîama gel çêdike... Gundan ji mirovan paqîj dike. Dijmîniyê kûr dike... Ji bingeha azadiya Kurdistanê ARGK'ê re teslîmiyetê dide pêş! Ev rûreşiyên wan baş tê zanîn ku, ji bav û kalên wan ve maye...

Pêvajoya şerrawestina PKK'ê ji rejîma Enqerê re ferenda dawî ye. Di vê pêvajoyê de du bûyarên balkêş hene: **1) Livbaziya gerîla ya Çe-**

pekçûrê (Bingolê) 2.) Meşa yekîtiya Kurdistanîyan li Bonnê. Ev herdu bûyerên girîng didin nîşan ku, gelê Kurd ji şer re jî, ji aşiyê re jî, di her rewşî de amade ye... Divê rejîma MGK'ê (Heyeta Ewlekariya Neteweyî) guhê xwe baş bide ser van herdu bûyeran.

Mesaja Serok Apo ku ji meşa Bonnê re şand, bi dewlemendiyan dîrokî tije bûn. Mesaja Serok Apo da fêrkirin ku, şoreşa rizgariya Kurdistanê hatiyê xwe daye ber derî. Ev nêzîkbûn, wezîfên me yê neteweyî, berpîrsiyarîyên me yê şoreşa Kurdistanê pîr kiriye. Divê em hîn bi hêzeke fireh van wezîfên neteweyî hembêz bikin. Parve bikin, bi pêş ve bibin. Di her gotinên vê mesaja dîrokî de mizgîniya serkeftinê heye.

Mesajê Sekreterê Giştî yê PSK'ê Kemal Burkay, yê HEVGIRTIN, KAWA, hemû hêz, grup û saziyên Kurdistanê, piştgiriya wan a ji şerê azadiya Kurdistanê re ku di meşa Bonnê de hat xwendin, bersivê ke manîdar e; ji parçekirin, parvekirin û listikên dijminên Kurdistanê re... Dem, pêkanîna van piştgiriyan hêja ne... Dem, çirandina dîroka îxanetê ye...

29'ê Gulanê zêdeyî sed hezar Kurdan li Bonnê bi yek dengêkî dîrîşmên biratiyê bilind kirin. Bi yek dilekî bang kirin: **"Bijî Yekîtiya Gelê Kurdistan"**. Ev bang zengê hemû guhan paqîj kir, xwediyê guh û serên zengarî ku heta niha digotin: "Kurd tu car nabin yek..."

Dewlet dest bi qetlîaman kir

Hêzên leşkerî yê dewleta Tirk, piştî êrişê gerîla yê li Çepekcûrê (Bingolê), li navçe û gundên Kurdistanê qetlîamên ku heta niha dimeşand, diwartir û firehtir kir. Hêzên leşkerî di vê qetlîama giştî de, çiya û gundan bi top û balefiran bombe dikin.

Operasyonên ku piştî êrişê Çepekcûrê dest pê kirin, pêşî li Sêgoşeya Çepekcûr, Mazra (Elezîz) û Mûşê, dû re jî li dorhêla Amedê, Serhedê û Botanê bi hemû hêza xwe ve didomin. Di operasyonên li dorhêla Çepekcûrê de 16 gerîla û 19 gundî mirin. Di vê bûyerê de 2 serbaz û 15 leşker jî hatin kuştin. Di operasyon û bombebaranên li çiyayê Agirî û Tendurekê de 3 gerîla mirin. Di vê bûyerê de jî çawîşek û 13 leşker hatin kuştin. Di vê navê de li dorhêla Bilîsê jî, di nav gerîla û leşkeran de şer derket. Di şerên Tûx (Tetwan), Hîzan, Gulpik, Hirît, Warê Ehmo, Gula Heciyan, Çemê Kêsan, Oxîn, Xupanîz û Çiyayên Qultîk de 4 gerîla mirin, 8 leşker hatin kuştin û gelek leşker jî birîndar bûn.

Li aliyê din êrişên gerîla yê li ser gundên cerdevanan jî didomin. Heta niha li 3 gundên Çelê (Çukurca) 7 cerdevan, li gundê Zinarê ya li ser Darahênê (Gêncê) 3, li gundê Hekarî Niçîz û Harûna jî 4 cerdevan hatine kuştin. Di van

êrişan de 21 cerdevan û leşker jî birîndar bûn. Gerîlayek jî mir.

Li navçe, gund û çiyayên Licê, Pasûrê, Wanê, Amedê û Bilîsê operasyon û bombebaranên balefiran didomin. Di van bombebaranên de, gundên Licê Banîtnê û Reşan hilweşîyan. Der mafê kuştî û birîndaran de agahî nîn e.

Gerîlayên ARGK'ê, li ser riyên kontrolên xwe didomînin. Cara dawî, li ser rîya Licê û Darahênê kontrolek bi vî rengî pêk hat. Hêzên leşkerî piştî vê bûyerê dest bi operasyonan kirin.

ÇAPEMENIYA DINYAYÊ JI NÛ VE LI BAR ELIASÊ

Serokê Partiya Karkerên Kurdistanê Abdullah Öcalan, dê di nav van çend rojên li pêşiya me de, li Bar Elîasa Lubnanê ji nû ve civîneke çapemeniyê li dar bixe. Li gorî çavkaniyên PKK'ê, dê Abdullah Öcalan di vê civînê de li ser Tirkîyê û Kurdistanê beyaneke girîng îlan bike.

Çapemeniya dinyayê girîngiyê mezin didin vê civînê. Heta niha ji gelek rojname, radyo û televîzyonên dinyayê, rojnamevan û bernamevanên bi nav û deng xwe gihandine Bar Elîasê. Dê ji Tirkîyê jî gelek rojnamevan herin vê civînê.

PÊNÛS



Amed Tigrîs

'Heger Xwedê bibêje erê' dê Seyda hînî Kurdî bibe

Em li der û dora maseya gilover rûniştine. Roja Duşemê ye. Hejmara rojnameya Welat a nû hatiye. Çend kes wê dixwînin û em çend kesên din jî ketine gale-galên şîrîn. Ji hevalên rûniştî yekê jî min pîrsek kir. Pîrs li ser zimanê Kurdî bû. Em li ser pîrsê hûr û kûr bûbûn. Hevalên din jî dev ji xwendinê berdan û guhdariya me dikin. Seyda jî, ji maseya din hat maseya me. Wî jî heta dawî guhdariya me kir.

Seyda bi temen e. Ez bawer im ku ew ji 50 zêdetir e. Tevahiya jiyana Seyda li Kurdistanê derbas bûye. Gundî ye. Bi salan di nav tevgera welatparêz de maye. Ew bêhejmar hatiye girtin. Ketiye girtîxaneyê. Bi gotina dagirkeran ew Kurtçiyekî kevin e. Ew

çend sal in ku Seyda hatiye Swêdê. Ew dema bi Kurdî diaxive em hemû wê demê ji Kurdiya xwe şerm dikin. Ji ber ku ew Kurdiyeke pak û çak dizane. Min bi xwe digot em hemû divê Kurdî ji Seyda hîn bibin. Lê, di dawîya sohbeta me de Seydayê me çi bibêje baş e!

Gelo armanca me çi ye? Xebata me ji bo çi ye? Ev çi keft û lefta bi salan e? Heta kengê û li ku em dê dora hînbûna zimanê xwe bigirin rêza yekemîn? Bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin? Cihê hînbûna zimanê biyanî dibistan e, ma yê Kurdî jî goristan e?

Ez Erebi di medreseyê de hîn bûm. Niha Erebiya min gelek baş e. Hem axaftin û hem jî nivîsandin. Ez bawer im ku, ez ji Erebekî baştir Erebi dizanim. Ez Tirkî jî paşê hîn bûm. Di dema xortaniya xwe de. Lê, ez neçûme dibistana Tirkan. Tirkiya min jî gelek baş e. Min bi Tirkî bi sedan pirtûk, kovar û rojname xwendine. Ez dereng hatim Swêdê. Ez niha bi Swêdî jî baş dizanim. Hem jî bi zimanê gramatikî. Lê, xoçeyê min î delal bi Xwedê ez nikarim bi Kurdî bixwînim. Dema ez Welat digirim destê xwe, ez nikarim tîpan ji hevdu derînim. Kurdî zor e. Lê belê Xwedê mezin e. Ez birayê te me. Heger Xwedê bibêje erê ez dê bi Kurdî jî hîn bibim...

Min bi awirekî matmayî li çavên Seydayê kevnare hûr û kûr mêze kir. Wek ku baniyê xanî bi ser min re were xwarê. Na wek ku asîman li ser min û hevalan rûne. Min xwe rane-girt û ji Seyda pîrsî:

Seyda, ma ji bo hînbûna ziman wehî ji te re tê, çi ye? Çima Xwedê Kurdî kiriye rêza herî paşî? Tu di zarokatiya xwe de Erebi, di xortaniya xwe de Tirkî û di kalîtiya xwe de jî Swêdî hîn bûyî. Ma Kurdî zimanê goristanê ye, çi ye? Her halde dê tu Kurdî di goristanê de hîn bibî, na?

Hevalên hazîr ji kenan ziko-pîsto bûn.

Ev rastî û trajediya me Kurdan e. Ne bi tenê trajedî, hem trajedî û hem jî komediya me Kurdan e. Gelo armanca me çi ye? Xebata me ji bo çi ye? Ev çi keft û lefta bi salan e? Heta kengê û li ku em dê dora hînbûna zimanê xwe bigirin rêza yekemîn? Bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin? Cihê hînbûna zimanê biyanî dibistan e, ma yê Kurdî jî goristan e?

Rastiya me ev e! Ev bûyera minak encama têkoşîna me ya dûr û dirêj dide diyarkirin.

Hinek ji me dibêjin: "Ez asîmîle bûme û bi Kurdî nizanîm." Hinek dibêjin: "Min bi zimanê biyanî dibistan xwendiyê. Ez nikarim bi Kurdî bixwînim û binivîsim." Hinek dibêjin: "Ji bo nivîsandina Kurdî ziman û lîteratura Kurdî têr nake." Hinek dibêjin: "Bi Tirkî gelek kes dixwîne. Ji ber vê yekê em bi Tirkî xelkê hişyar û bi rêxistin dikin." Hinek dibêjin: "Ziman haletê ji hevdu fêmkirinê ye. Ji ber wê yekê jî ferqa Kurdî û Tirkî tune. Ziman mesela şoreşê ye. Ziman û lîteratur karê reformîstan e..." Werhesil hemû rê diçin gundekî. Gundê xwe biçûkdîtî û xwe înkarinê. Gundê bi xwe bêbaweriyê!

Li Kurdistanê pergînên mewlûdê

M. Zahîr Kayan

Îro li Kurdistanê gelek kevnepên girîng hene, em wan bi çavên xwe dibînin û dilxweş dibin. Her wiha Kurdistan xezîneya çand û wêjeya kevnare ye. Ew gelên ku di nav jiyana wan a hemdem û kevin de kevnep bi pîrranî hebin, wê demê mirov dikare der heqê wê civatê de hinek ramanên berbiçav derxe holê. Em îro bala xwe didine civaka Kurd ev rastî xwe bi rûmet diyar dike. Lew bi hezaran kevnepên gelêrî di nav jiyana Kurdan a hemdem de xwe diparêzin. Di gundan de ev rastî xwe dide diyarkirin û em jî di vê der heqê de dibin xwedî agahiyeke bi rûmet. Kevneşop, çanda gelan a dewlemend didin xuyakirin, îro jî van kevnepan ên leyistikê yên çand û wêjeyê, yên dilanê, yên ol û toreyê, yên destan û lorîkan û hwd giş di nav civak Kurdan de hatine parastin û ta niha xwe dane ber dewamkirin. Emê niha li ser kevnepoke berbiçav lêkolînên xwe binivîsin, ev jî "Pergînen Mewlûdê" ne. Pergînen mewlûdê di nav pîrraniya gelên misilman de tê dîtîn. Lê em dikarin vê dîtina hanê jî bibêjin, pergînen mewlûdê di nav gelê Kurd de bi awayekî dewlemendtir têne bikaranîn. Di gelek gundan de ev rewş berdewam dibin û me jî ev bûyer bi çavên xwe dît.

Li Kurdistanê ev pergînen hanê bi pîrranî di bin bandora meleyan de ye. Lew mele li medreseyan ev berhemên hêja, **Mewlûd, Nûbar, Dîwana Mele, Mem û Zîn, Şîseban Zembîlfiroş** û hwd xwendine û ji ber kirine. Der heqê pergînen mewlûdê de gelê Kurd li gorî xwe hinek dîtî û baweriyên kevnare derxistine û rewşa van pergînen hanê xweştir û dewlemendtir kirine.

Ew kesên ku mewlûdê bide ji bo hinek armancan dide û ew armanc jî ev in.

1. Ji bo dewlemend bibe.
2. Ji bo nezera çavan lê nekeve
3. Ji bo bereketê
4. Ji bo derketina ji rojên reş û teng
5. Ji bo navê dinê
6. Ji bo dayîna hinek soz û qeraran
7. Ji bo baweriyên kevnare yên di nav gel de hemdem û hwd.

Ew mala ku mewlûdê dide, pêşî diçin gazî mele dikin û tînin malê. Dû re gazî gundiyan gişan dikin, carina ew rewş xwe dide guhertin.

Mala ku mewlûdê dide sîrf gazî hinek mirovên bi pesin û qedirzan dikin. Le bi giştî di van kevnepan de gazîkirina hemû civatê pêwîst e.

Ev vexwendî tîni li mala xwediyê mewlûdê rûdin û li hêviya mele disekin. Wê demê xwediyê malê tîne li erdê hinek xwarin û vexwarinan datîne. Ev xwarin û vexwarin jî ev in:

Ar, nîsk, genim û ceh, şekir û av cizdanê pereyan, xwê, rûn, penêr, toraq, û hwd.

Mele dest bi xwendina mewlûdê dike wê demê her kes bi awayekî baş û bêdeng li mewlûdê guhdarî dike. Ji kesî deng dernaye. Li gorî baweriyê gelê Kurd mewlûd pîroz e.

Ew rewş xwe di bingeha mewlûdê de dide xuyakirin. Lew di Mewlûdê de jiyana H.Mihemed tê ziman û yê ku ev nivîsiye jî şairekî (Helbestvan) Kurd e. Ev xweşnasiya Mewlûdê ya di nav gel de bi saya helbestvanê Kurd yê bi nav û deng **Mele Ehmedê Batê** ye. Gelê Kurd vê Mewlûdê bi Kurdî guhdarî dike û jê fêhm dike, lew Mewlûd bi Kurdiyeke paqij hatiye amadekirin. Mewlûda Meleyê Batê, di civaka Kurd de, gelek xisletên hêja, yên alîkarîkirinê jî

derxistiye holê. Dema gel ji bo mewlûdê li hev diciviyayan, nan û vexwerina xwe dixwarin radibûn dest bi karên xwe yên din dikirin. Ango li hev kom dibûn û pîrsgirêkên gund û gundiyan çareser dikirin. Di gund de kîjan xizan bûya, kîjan ketî û di tengasiyê de bûya li wî qencî dikirin û ew kes ji wê rewşê didane derxistin. Exleb di van pergînen mewlûdan de axa û mele û hinek mirovên kal û bi rûmet beşdarî dibûn, lew ev kes di nev gelê Kurd de xwedî qedr û qîmetin. Ev kes di navbera xwe de, der heqê pîrsgirêkên gund ên ekonomîk û siyasî de peyvîneke girîng li dar dixin.

Li ser van bûyeran elametên xweş pêk dianîn. Carina jî di gund û bajar, navçeyan de hinek malên mewlûd didan, herî peşîn xwarinek çêdikir. **Keşke, helisa bin dîzê, şerbet** û hwd. Gazî hemû kesên derdora xwe dikirin. Rewş wisa dide xuyakirin ku ev mewlûd di nava gel de jiber jî tê xwendin. Lê bi kurtasî rewşên van pergînan girîng e ku wiha bê kirin.

MALA KU MEWLÛD DIDE

1. Ji bo xwarin û vexwarinê amadekariya xwe diqedandin
2. Sibehê yan jî ber bi nîvro/yan jî serê êvarê gazî mele û cîranan dikirin
3. Însan li hev kom dibûn û bi rê û rêzan rûdiniştin. Mezin li jor, biçûk li jêr
4. Dema mele Mewlûdê bixwenda herkes tiştêk diavête erdê. Ji bo bereketê xwediyê mewlûdê gelek tiştên xwarin û vexwarinê dianî pêşiya mewlûdê
6. Mewlûd bi dengê xweş dihat xwendin.
7. Şerbet amade dibûn, di dawîya mewlûdê de di hate vexwarin.
8. Sohbet û civatên girîng li hev kom dibûn û xizan û bêkes dihatin berbiçavkirin.

An serxwebûn an tunebûn

Dilê min wek ba û bahoz
Dipijqîne agrê Newroz
Li min sond û peyman û

soz

An serxwebûn an
tunebûn.

Nadim nadim welat nadim
Ez dev ji dozê bernadim.

Diçinim tovê jiyane
Av didim bi xwîn, xwêdanê
Rizgar bikim Kurdistanê
An serxwebûn an
tunebûn.

Nadim nadim welat nadim
Ez dev ji dozê bernadim.

Gelekî bi hêrs û kîn im
Çavê dijmin dirijînim
Reş û tarî diqetînim
An serxwebûn an
tunebûn.

Nadim nadim welat nadim
Ev dev ji dozê bernadim.

Êdî nayême seknandin
Bi topan nayem tewandin
Armancam welat standin
An serxwebûn an
tunebûn.

Nadim nadim welat nadim
Ez dev ji dozê bernadim.

Dinya alem wê bibîne
Veger û rev li min nîn e
Peyva min hêvî mizgîn e
An serxwebûn an
tunebûn.

Nadim nadim welat nadim
Ez dev ji dozê bernadim.

Sebr û sebat, tab û xebat
Nêç û zarok, mal û malbat
Hemî dînim rîya welat
An serxwebûn an
tunebûn.

Nadim nadim welat nadim
Ez dev ji dozê bernadim.

Digerim li çiyayê bilind
Bi rûkî sipî û ser bilind
Bi şehîdbûnî we mirinek
rind

An serxwebûn an
tunebûn.

Nadim nadim welat nadim
Ez dev ji dozê bernadim.

Çek û sîleh li milê min e
Tirs û xof qet bi mir tune
Zanim welat tev e min e
An serxwebûn an
tunebûn.

Nadim nadim welat nadim
Ez dev ji dozê bernadim.

Adar Jiyan



Kêliyek ji paş mejî û vegera bêmirin

Selîm Biçûk

Hey gulê ciwanê!

Jîna dilê min a bêmirin! E-
vîndara şêrîn!

Dibîni vê noşgeha bême-
rez. Bêhna mirinê dibarîne.
Ev muzîk guhên mirov kerr
dike. Qêrîn û hawara van
serxweş û mestên bêtore.
Bermayên vê civaka bêser û
bin. Mirovên sar, bêgiyan. Êdî
her tişt di vê civakê de miriye
heta bi mirovahiyê. Her tişt
xwe dest çêkiriye. Hela li van
keç û xortan binêre, heta
kenê wan ne ji dil e, bi zor
derdixin. Vê gulê bêhn bike!
Bêhna mirinê dertîne. Gelo,
di vê jiyana mirî de, dilên me
dikarin bi evîniyê bihesin?

Gula min! Zîna Memê xwe!
Xwe hîn nêzik bike. Guh û
mejiyê xwe veke. Çavên xwe
bigire. Bîranînên xwe hêdî
hêdî vegefirne. Erê, erê rawes-
te! Li wir, li ser Kaniya
Memê.. Li ber pala "Tehtên
Reş", xwişîna avê. Bayê
hênik biskên siya, pêl pêl ra-
dike semayê xec, gulzar, lale
û beybûn. Êdî li ber lédana
dilên me lotikên jiyane gir-
tine. Em bêdeng, lê çav
dibêjin, dil dibihîzin. Bêdeng,
bêdeng bimîne. Zîna min!
Guh bidêre: Xşşş... Ava ka-
niyê bi lez ber bi jêr ve di-
xuşe. Evîndarê wê "Dicle"
bêaram e, dixwaze hembêz

bike. Na, na dengê bayê bibi-
hîze: Huvv... Ax! Xweş
Gulê! Van herdu bilbilan çî
besteyên evîniyê dixwînin.
Gelo, ew jî mîna me ji hev
hez dikin? Ax Gulê! Bilûra vî
şivanî ji nav perdeya dilan
dengê xwe dertîne. Ez dibêjim
evîndarêkî bi ax û dax e.

Na, Gulê! Çavên xwe ve-
neke, hîn maye. Dema te ra-
dihîşt beroşa şîr, dixwest ve-
gerî mal. Çav diman di çavan
de. Dest li dest û êdî bêtebat
dilên me lédidan. Belê, mîna
vir me nedigot: Çûz bîs... Na,
tiştên me dixwest em bibêjin
bi çav û dilan bûn. Çêkirin û
sextekarî nebûn. Her tişt xwe-
ristî, rast û ji dil bû. Melodiyên
evîne, ahengên bêmirin bûn:

Xişşş... Huvv... Çivçiva çivik,
şalûl û bilbilan bû. Bilûra şiva-
nan, merîna pez û berxan bû.
Axaftina çavan, lédana dilan
bû. Lê, li vir evîndarî jî, mîna
her tiştî mirî, sexte û çêkirî
ye.

Ax! Dengê vê muzîkê
guhên min diêşîne. Bêhna mi-
rinê pozê min wêran kir. Ev
serxweş ên mey û badê çî
bêmerez in. Li ser "Kaniya
Memê" li ber pala "Tehta
Reş". Em bi awazên xweris-
tiyê, bi besteyên evîne, bi
dengê av û bayê, bi axîna di-
lan serxweş diketin.

Gulê! Bêrîvana min! Edî
destûr heye ez a dilê xwe ji te
re bibêjim. De hîn guhên xwe
nêzik bike. Bila kes me nebi-

hîze. Çavên xwe bigire. Bila,
ev çavşînê bêbav ku ji êvare
ve li me dinêre me nebihîze.
Hê jî, hê jî nêzik Gula min!
Zîna Memê xwe. Destê xwe
bide destê min. Em vegerin
çavkaniya bav û kalan... Ser
"Kaniya Memê" li ber pala
"Tehta Reş". Botana Rengîn
cihê evîne, êdî bes e ev qirêj û
gemar. Bes e evîna derewîn û
durû mîna vê civakê. Em ve-
gerin, em vegerin deşt, çiya û
zozanên xwe. Buhîştê cihanê,
Kurdîstana xwe. Li hêviya me
ye. Sînga xwe ji bo evîndaran
vekiriye. Li wir emê daweta
jîne li dar xin. Lê ji bir neke,
xort û qizên me, hemû ci-
wanên me vexwendiyê vê ve-
gera bêmirin in.



Hejmara nû ya Kedkarên Welatparêz derket

Kedkarên Welatparêz bi eynî navî lê bi Tirkî hejmara
xwe ya duyemîn jî derxistin.

Kovara Kedkarên Welatparêz mehane, li ser çand,
huner, nûçe-şîrove û zanistê radiweste. Di vê hejmarê
de kovar rûpelên xwe ji mijarên cihêreng re veqetandiye.

Ji nivîsên di rûpelên kovarê de hin jê ev in: Tayfun
Îşçi "Pirsgirêka Zimanê Zikmakî, Hevotina Demokratîk û
Azad", M. Saîd Üçlü "Mamosteyê Gel Divê Bibe Pêşengê
Gel", Nagîhan Apulcan "Jin û Civak", Özkan Tur "Gelem-
şeya Tendurustî" û "Em Kurdî Bihewisin". Di kovarê de
bi tenê ew nivîs bi Kurdî hatiye amadekirin. ên din bi Tir-
kî ne. Kovar tevî hev 36 rûpel e.

Sala 1993'yan dê bibe sala gelê Kurd - 2

ŞERÊ BAŞÛR

Di vê sala çûyî de, li Kurdistanê Başûr şerek çêbû. Ev şer ji aliyê hinekên din ve dihate xwestin. Bi rastî me nedixwest ku şerek wiha bibe. Lê, rewşa ku em tê de bûn, me lê dinêrî, dijmin ji vî şerî pê ve tu rê nehiştibû. Ev şer ji aliyê dijmin ve çêbû. Dijmin salek haziriya vî şerî kir. Di sala 92'yan de, hemû dinyayê da piştî xwe. Di şovenîzmê de, hundirê xwe kire yek û çiqas Kurd ên li dijî me hebûn kire dostê xwe, dijmin bi vî rengî bi ser me ve hat û şer da pêşya me. Em bireviyana baş dibû? Na... Em teslîm bibûna baş dibû? Na... Mirina herî xerab ev bû. Ji ber vê yekê, me li ber xwe da. Em yek bûn, ew sîh-çil bûn. Lê me li ber xwe da. Mirovên bi awayên eşîrtiyê bi hev ve girêdayî. xwestin bi hin listikan werin bi ser me ve. Me rê nedî. Me got bes e. Milet yekîtiyê dixwaze, ji Başûr û Bakur re yekîtiyê xwestin. Li ser planên dijmin şer divê nebe.

PARASTINA WE JÎ KARÊ ME YE!

Li Başûr nîvdewletek çêbû. Li ser karê me çêbû. Bi rastî tiştên li ser karên mirovan çêbibin mirov pê re ye. Lê dijmin çi kir? Xwest vê nîvdewletê, dewleta ku li Başûr bi federaliyê çêdibe, li hember me rake û hinekan vî karî ne baş kirine karê xwe. Digotin em dewletê çêdikin, bila PKK rabe. Ne li Başûr bi tenê rabe, bila li hemû Kurdistanê rabe. Dijmin ev dixwest. Me gote na. Ne ji şerê me be, dewleta we ya federalî jî namîne. Meclîs çêkiribûn, me gote wan, meclîsa we jî namîne. Netîce, dijmin xurt bi ser me ve hat. Ên bi dijmin re girêdayî jî, wekî din çare ji wan re tune bû û bi ser me ve hatin. Ev şer bû. Bi sedan însanên Kurd mirin. Dijmin digot, 2 hezar kes ji PKK'ê mirin, ne rast bû. Belê me jî şehîd dan. Nêzîkî 100-150 şehîdên me jî çêbûn. Lakîn hew ewqas bûn. Ên bi dijmin re girêdayî tirsîyan, dîtin ku dijmin nikare li hember me bisekine. Ên ku dixwestin me di 2 rojan de hilînin, nêrîn ku di hefteyekê de, ew bi xwe radibin. Ev jî ne hindik e. Qeweta gel çi ye? Şervanên gel çi ne? Nas kirin. Bi rastî me vî şerî nedixwest. Lakîn bû. Di vî şerê ku dijmin dabû ber me de, me bi qehremanî li ber xwe da û me dijmin bêhtir ji Kurdistanê dûr xist. Ne ji Kurdistanê Bakur bi tenê, me ew ji Kurdistanê Başûr jî dûr xist. Ev nîvdewleta ku niha çêdibe, em baş dizanin ku parastina vê nîvdewletê jî karê me û şerê me ye.

Hemû gelê Kurdistanê, bi giştî jî gelê Kurdistanê Başûr li hember me bang dikirin û digotin: "Va ye em dewletekê çêdikin û PKK li dijî radibe." Ev ne rast e. Dijminê me yê mezînan her roj

dibêjin ku, ji vê dewletê re PKK'ê rê vekir. Hûn baş dizanin. Berê jî hûn hebûn; we berê jî serhildan çêdikirin. Dû re hemû dijmin dibûne yek û we tune dikirin. Yek gundekî we li Kurdistanê Başûr nema. Hûn bi milyonan derketine der. Piştî ku PKK rabû û dijminê mezînan tirsand, ev dewlet êdî bi ser we ve nehat, heta alîkariya we kir. Ev jî tirsî me bû.

Li ser vê yekê, hûn niha dibin nîvhikûmet, parlamentoya we heye. Em we pîroz dikin. Lê, hûn çawa gihîştin vê radeyê, divê mirov bibîne. Hûn ji vî şerê ku li Başûr pêk hat ne razî bûn. Em jî ne razî bûn, lê kê ev şer derxist? Em naxwazin li Kurdistanê Başûr bi Partiya Demokrat û Yekîtiya Niştîman re neyartiyê bikin. Dîsa em dostaniyê dixwazin.

Hûn îro çawa ji xwe re dibêjin federasyon; bibêjin ji Kurdistanê Mezin re jî federasyon. Hûn çawa dibêjin ji bo me meclîs; bibêjin ji Kurdistanê Mezin re jî meclîs. Hûn çawa dibêjin bila rejîma Iraqê federasyonê qebûl bike; bila rejîma Tirk jî, ji bo Kurdistanê Mezin federasyonê qebûl bike. Divê em li hember dijminan bibine yek, alîkariya hev û din bikin. Riya rast ev e.

Li ser vê em bang dikin. Rabûna gelê Kurdistanê Mezin ra-

Em bang dikin. Rabûna gelê Kurdistanê mezin rabûna we ye, şerê wan şerê we ye. Têkoşîna wan li we rê vekir, ji bo nîvdewlet û federasyonê: Divê ev rewş bê parastin. Hûn bi serê xwe nikarin. Ger ne em bin, dê dijmin bi ser we ve were û halê we bibe halê berê.

bûna we ye, şerê wan şerê we ye. Têkoşîna wan li we rê vekir, ji bo nîvdewlet û federasyonê. Divê ev rewş bê parastin. Hûn bi serê xwe nikarin. Ger ne em bin, dê dijmin bi ser we ve were û halê we bibe halê berê.

93'yê BIKIN SALA YEKÎTIYÊ

Em dixwazin, sala 93'yan bibe sala yekîtiyê, bibe sala biratiya Başûr û Bakur, bibe sala alîgiriyê. Ev yek ji gelê Bakur bêhtir ji we re lazim e. Ev şerê ku di navbera hêzên Bakur û Başûr de pêk hat, di vî bo sala 93'yan, rê nîşan bide. Belê me jî şehîd dan, Başûriyan jî şehîd dan. Em wan jî şehîd dihesibînin. Emê sala 93'yan, bi bîranînen van şehîdan bikin sala yekîtiyê. Biratiya mezin li ser


siyaseta rast e. Ez dîsa dibêjim, em di 93'yan de amade ne. Em ji van nebaşiyên berê yê bûyî dûr bikevin, zerarê nedine hev, nekevin xizmeta dijmin, çî ji destê mirov bê, bi alîkariyê hev û din re bikin. Ev rast e û em pê re ne.

Hemû hêzên welatparêz, eşîret û şexsên welatparêz... Divê em bêhtirîn di vî salê de xwe yek bikin. Di meclîs û parlamentoya Kurdistanê de xwe yek bikin. Di hêzên welatparêz de xwe yek bikin, di artêşa gel de xwe yek bikin. Li ser riya yekîtiyê em bi hev re bimeşin. Em silavê li gelê Başûr dikin, serkeftinê jê re dixwazin. Hemû hêzên welatparêz, hêzên li bakurê Kurdistanê jî dixwazin gavanan biavêjin. Belê, li Kurdistanê Bakur hemû gel bûye yek. Di bin ala PKK'ê de yekîtiya neteweyî çêbûye.

Di şer de çêbûye, bi xwîna hezaran şehîdî çêbûye, bi milyonan gel di tevgerê de ne. Lê em dîsa dibêjin, însanên welatparêz, li derî welat, li hundirê welat bi çek, bêçek dema bixwaze tevî vî cepheyê bibe, tevî şerê gel bibe, bi fişekê, bi qirûşekê pere alîkariyê bike, hêzekê alîkariyê bike, em hazir in. Berê jî me dixwest em yekîtiyê çêbikin. Ev partiyên ku digotin, "Em demokrat in, em sosyalîst in" me ji wan re digot werin. Karê gundiyan, karê şer, ên herî zehmet em dikin, hûn jî li Ewrûpayê nivîskariyê bikin, dîplomasiyê bikin. Me di 80'yî de got, di 84'an de got, di 85'an de got, em dîsa dibêjin. Me ji wan re digot, li ser riya çekê nesekinin, wan ji me re digot: "Dev ji çekan berdin.", "Şerê çekdarî zerara Kurdistanê ye." Ev ne rast bû. Bê şerê çekdarî, Kurdistan namîne. Îro îspat bûye ku, bêtir şerê çekdarî Kurdistanê jî holê radibe. Ger berê vî rastiyê nedidîtin, bila niha bibînin. Bi xwe jî niha biryar girtine û dibêjin: "Em jî ji bo şerê çekdarî hene." Werin, hemû çiyayên Kurdistanê ji bo we vekirine. Werin, şexsek were, an du şexs werin. Emê we di çiyayên Kurdistanê de biparêzin. Gelek zehmet e ku mirov di çiyayên Kurdistanê de, bêçek bigere. Qehremanî û cesaretê dixwaze, fedekariyê dixwaze. Me kiriye û em di xizmeta gel de ne. Bila ev şerê bibe ya me hemûyan.

ŞOREŞA KURDISTANÊ ŞEREF ALEMÊ YE

Me heta niha nikaribû bi xurtî alîkariya dostên xwe bikin. Ne di dinayê de, ne jî di Kurdistanê de. Bêhtir jî di Tirkiyê û Rohhilata Navîn de. Binêrin li Kurdistanê şoreşa mezin bi çî awayî çêdibe. Şoreşa Kurdistanê şerefa alemê ye. Dinya ser û binê hev bû, sistema Sovyetê pelîşt, li Ewrûpa reşahî û kevnepereştî bilind bû. Me li hember wan şoreş rakir. Ev şoreşa me, şerefa însanan bû. Ji



Sekreterê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan

bo vî divê dostên gelê Kurd zani bin ku, ne ku ew alîkariyê ji me re dikin, bêhtir em alîkariyê didin dostan û hemû gelên bindest.

PARTIYA ME JIYAN Û ŞEREF E

Hemû gelê Kurdistan! Hûn dizanin ku, ev şerê bûyî di bin serokatiya PKK'ê de bûye. Me partiyê, bi xebatake mezin amade kir. Xebatên PKK'ê xebatên bingehîn ên însaniyê ne, xebatên welatparêziyê ne, xebatên serbixwebûnê ne û xebatên sosyalîzmê ne. Me di PKK'ê de însanên mezin gihandin. Însanên pak, însanên ji sedî sed bi însaniyê re yê bi gelê xwe re, yê bi azadiyê re û yê bi qehremanî û cesaret meşîyan me gihand. Ev 20 sal in ku di PKK'ê de însan digihên. Berê tu kesî pîrsek nedikir ji bo gel, ji bo welat. Dilopek xwîn nedirijand, ji bo gel, ji bo welat. Niha ref bi ref, kom bi kom hicûm dikin ji bo xwîna xwe birêjin. Ev bi PKK'ê çêbû. Partiya me, PKK şerefa gelê Kurd e. Di tarîxa Kurdistan û Rohhilatê de jiyana e, şerefa e.

Di vî Newrozê de 20 salên xebata Rizgariya Neteweya Kurdistanê tijî dibin. Me li ser siyaseteke Kurdistanê xebat kir. Me di 73'yan de dest pê kir û nefes bi nefes, roj bi roj, meh bi meh, sal bi sal me xwe gihande 93'yan. 20 sal tijî dibin. Ne xew, ne westandin, ne fibûn, ne birçibûn, ne tunebûn. Tu yekî nedigot ez Kurd im. Tu yek bi cesaret bi me re nedimeşiya, Dîsa em bi qerara xwe re bûn, bi sozê xwe re bûn û em hatin. Divê hûn rewşa destpêkê û ya îro baş bizanibin. Tirsî dijmin çî bû û cesareta me çî bû, li ser bisekinin. Di van 20 salan

de, doza we, tarîxa we çawa hate guhertin, mirovê Kurd çawa hate guhertin, mirina Kurd çawa bû jiyana, xerabî çawa bû çeyfî, gemar çawa bû paqijî, parçebûn çawa bû yekîtiyê, ketin çawa bû serkeftin, tirs çawa bû cesaret; hemû di van salan de û di vî karê de çêbûn. Berê me xwe çêkir, partî çêkir. Hûn dibînin, mirovek di destpêkê de çiqas bi tenê be, tu kes li dorê nîn be, durist be û bi sozê xwe re be, bi biryar bimeşe, ew dikare miletekî rake.

Jiyana min û karên min ji bo we, îsbata vî yekê ye. Bila tu kes û Kurd nebêje ku, ez nikarim tiştekî bikim. Di tunebûnê de, di reşahiye de, di tirsî mezin de, me ev tişt çêkirin. Niha bi milyonan gel, bi hezaran çekdar bi cesareteke mezin dimeşin. Ew çawa çêbû? Îspata mezin ev e. Mirov xiyaretê neke, durist bimeşe, mirov bi gel nefize, tiştên ku min kiriye, hûn dikarin sed car ji min bêhtir bikin. Bi serokatiya xwe nefelîzin, bi siyaseta nefelîzin, durist bimeşin, îspat bûye ku dinya li hember we rabe, nikare we ji holê rake.

Tecrûbeyaya 20 salan ne hindik e. Em bi vî tecrûbeyê ketin 93'yan. Bi hazirî, biryar û nêrîneke mezin. Em dijminê xwe biçûk nabînin, em zanin dijminê me xwest sala 92'yan bike sala mirina me. Di 12'ê Îlonê de, karê Evren û Özal yek bû.

Tunekirina Kurdan. Demîrel û Înönü jî li dû vî ne. Em li hember sekinîn. Giş bûne kepaze û zanin ê bi ser dikeve em in. Ger jî vir û pê ve, gelê Kurd xwe bi xwe nefelîze ne mimkun e ku, bi ser nekeve. Em xwediyê sozê xwe û mesûliyeta xwe ne. Dê ev sal, bi vî biryarê bibe sala gelê Kurd.



Ji aliyê çepê ve; Tîmûrê Xelîl, Emerîkê Serdar, Porsora Sebrî, Vanîkê Elixan

Berpirsiyarê Giştî yê rojnameya Riya Teze Emerîkê Serdar:

'Rojnameya me temenê Kurdên Sovyetê ye'

Rojnameya Riya Teze ku li paytexta Ermenîstanê Yêrîvanê, bi zimanê Kurdî (Kurmançî) dertê, rîeynîka dîrokî ya Kurdên Sovyeta Berê ye. Li vê erdnîgariyê (coxrafayê) nivîskarên ku navê wan derketiye hema bi giştî çavkaniya wan Riya Teze ye. Rojnameya Riya Teze ku ji nivîskarên nîfşa yekemîn **Emînê Evdal, Erebe Şemo, Mikailê Reşîd, Heciyê Cindî** û yên piştî wan **Karlênê Çaçanî, Şakiroyê Xudo, Ordîxanê Celil, Emerîkê Serdar** û ji yên din re bûye dibistan, di sala 1930'î de bi tîpên Latînî dest bi weşanê kiriyê. Rojname li ser biryara Stalîn di 1937'an de tê dadan; piştî mirina Stalîn di 1955'an de vêca bi tîpên Kirîlî dest bi weşana xwe dike.

Niha di redaksiyona Riya Teze de, **Emerîkê Serdar, Vanîkê Elixan, Babayê Keleş, Tîmûrê Xelîl, Porsora Sebrî û Meyana Evdil** hene. Piştî ku me bi Berpirsiyarê Giştî yê rojnameyê Emerîkê Serdar re hevpeyvînekê kir, em pê hesiyana ku Riya Teze bi zor û rînceke mezin weşana xwe didomîne.

Hûn dikarin der barê Riya Teze de çi bibêjin? Derketina wê çi beşdariyê li çanda Kurdî kiriyê?

- Ev rojname temenê (emrê) me yê li vir e. Em ji bo Riya Teze bibêjin ku dîroka gelê Kurd a li Sovyeta Berê ye, nayê wê maneyê ku em derew an jî wê mezin dikin. Riya Teze, rojnameya ku cara pêşîn li Sovyeta Berê bi zimanê Kurdî hatibû weşandin û ya bi tenê bû. Ji ber vê yekê ne bi tenê li Ermenîstanê her wiha li hemû welatê Şewrê (Yekîtiya

Komarên Sosyalîst ên Sovyetê) bû dengê gelê Kurd. Ji bo pêşvebirina zimanê nivîskî yê Kurdî xizmeteke baş kir. Her çiqas di destpêkê de weşana me bi giranî li ser wêje û çandê bû jî, pişt re li ser warên dîrokê, etnografiyê û muzîkê jî rawestîya. Nûçeyên li ser çihana Kurd gihand xwendevanên xwe. Di danasîna wêjevanê (edebiyatvanê) klasîk û hemdem de roleke girîng leyîst. Nebi tenê çanda Kurdî bi gelê me da nasîn, gelek nivîskarê Ermenî jî bi gelê me da hezkirin. Di navbera gelê me yê ku li Komarên Sovyetê yên curbucur de belav bûbûn, bû pir.

Tiştê ku em dizanin Riya Teze di bin siya Partiya Komunîst a Ermenî de derdiket. Piştî hilweşîna Sovyetê, tu guherîn di politîka we ya weşanê de çêbûn? Hûn politîkayêke weşanê ya bi çi rengî dişopînin?

- Berê hin weşanê ku me ji bêqavî (mecbûrî) dikir hebûn. Îro em bi giştî politîkayêke neteweyî dişopînin. Em li ser bûyerên ku li Kurdistanê diqewimin radiwestin, dixebitin ku em van bûyeran bigihînin xwendevanên xwe. Em li têkoşîna rizgariya neteweyî û li pêşengên wê xwedî dertên. Em nêzîkahiyeke mezin dipêjînin, hîs dikin. Di weşanên me de ev xal girîng in. Haya me ji guherînan civaka me heye û li gorî vê guherîna politîkayêke me ya weşanê jî heye.

Berê rojname bi alîkariya dewletê derdiket. Niha alîkariya daringî, aborî çawa tê temînkirin?

- Îro gelê me ya herî mezin hêza aborî û daringî ye. Ango finansman e. Rojname berê di heftiyê de du car derdiket. Niha

dikare heftiyê carek derkeve. Em bi bexşan (alîkariya aborî) li piya ne. Hûn jî dizanin ku rewşa xwendevanên me ji aliyê aborî ve qet ne baş e. Ew jî zêde nikarin ji me re bibin alîkar. Haya me ji girîngiya rojnameyê ji aliyê ziman û çanda Kurdî ve heye. Ji ber vê yekê şêş xebatkarên me ku bi tenê rojnamevantiyê dikin, ji demeke dirêj ve ye ku mehmiya xwe nastînin û peywira xwe didomînin. Pêdiviya me bi destekê heye. Me îro politîka xwe ya weşanê nû kir, lê em bi teknîkeke 200 salî dertên. Ev rewş dibe sebeb ku gelek kes tê de bixebite. Em ji rewşên bîr, sazî û dezgehên Kurdî alîkariyê dipên. Faksek jî dikare ji bo me gelek tiştan biguhere.

Ji bo pêşerojê armancên we çi ne? Hûn dixwazin çi bikin?

- Beriya her tiştî divê em vê rojnameyê ji vê teknîka kevnare bifelîtin. Rojnameya me dixwaze bi rewşên bîr û damezraweyên Kurd re, bi taybetî jî bi yên li welat re têkiliyê deyne û bi pêş ve bibe. Em dixwazin wan nas bikin, danûstandina agahiyê (înfòmasyonê) bikin. Bi vê hevkarîyê re em dê hîn bêhtir nêzîkî armancên xwe bibin û xizmeteke baş dê were kirin. Lê jî bo me destek û piştgirî şert e.

Li derveyî Ermenîstanê belav bûye ku rojnameya me ji ber tengasiyên daringî (madî-aborî) hatiye dadan. Ev ne rast e. Belê tengasiyên me hene. Lê belê rojname bûye xwîn û canê civata me ya li vir. Divê dengê Riya Teze qut nebe. Di gel hemû asteng û tengasiyan em dê weşana xwe bidomînin.

Hevpeyvîn:
Mehmet Aktaş

AZADÎ

Abdurrahman Durre



Xwedê bela neheqan bide

“ Kî neheq be, Xwedê bela wî bide”. Ev gotin der heqê kesên ku, neheqiyên xwe qebûl nakin de tê gotin. Du kes, du gel, du dewlet, du hikûmet, an jî du kom, du komên gerîla, gerîla û hikûmet ku li dijî hev şer dikin, li hev nayên û hev û din neheq dikin, her yek xwe bi heq dibîne û dibêje: “Dijminê min neheq e” û bi vê gotinê jî vê neheqiyê tîne ziman. Bi rastî jî gotineke pîr manîdar û xweş e. Neheq û vîrekan jî kifş dike. Lewre dema mirov vê gotinê dibêje, li neheqan xweş nayê.

Rewşa TC û gerîla jî îro hatiye vê radeyê. Bivê nevé, vê gotinê bi mirov dide tekrarkirin: “Xwedê bela neheqan hezar carî bide”. Qehr û xezeba Xwedê jî li ser wan be.

Rastî ev e: Heta ku TC hebûna gelê Kurd, mafên wan ên demokratîk û siyasî qebûl neke, heta dev ji vê demegojî û siyaseta xwe ya înkariyê bernede, ev mesele hel nabe û girêk nabişkive.

Baş e, neheq kî ye? Divê em bi hev re li rewşa wan mêze bikin, rastiye bibînin û bibêjin. Ji roja ku, PKK'ê şerrawestîna xwe ya yekalî îlan kiriyê û heta bûyera li Çepêkçûr (Bîngolê) ku 33 leşkerên Tirk

hatin kuştin, hikûmeta TC'ê 82 gerîla, 27 sivîl kuştine, bi sedan kes birîndar kirine, bi hezaran Kurd girtine û li wan îşkence kirine, bi sedan gund û mezra vala kirine, tîm û leşkerên wan Kurdistanê ser û binê hev kirine ku hê jî dikin. Fermandar û rayedarên wan, ji zirt û fortên xwe yên nijadperest, faşîst û asîmîlekar dûr nemane û ber bi riya lihevhatinê, aştiyê, naskirina Kurdan, heq û hiqûqên wan ên demokratîk, însanî û siyasî ve yek gavekî neavêtine, di vê riyê de bihostek bi pêş ve neçûne û hê jî dikujin, hê jî talan û wêran dikin, hê jî navê Kurd û Kurdistanê bi sed “qulhuwela” nayînin ser zimanê xwe û hê jî siyaseta xwe ya kemalîst, a asîmîlekar, a nijadperest didomînin. Bi ser de jî zirt û fort li xwe didin û dibêjin: “Me PKK qedand, PKK tarûmar bûye, ew eşqiya ne, dawîya wan hatiye û hwd.”. Bi vê siyaseta xwe jî hem gerîla, hem jî gel tehrîk dikin.

Dewleta Tirk dev ji van şaşî û çewtiyên xwe berneda. Ta ku PKK'ê jî di 25'ê Gulanê 1993'yan de li Çepêkçûrê (Bîngolê) êrîş bir ser leşkerên wan û 33 leşker kuştin, nêzîkî 20 kesî jî dîl girtin. Dû re jî, fermandar û rayedarên TC'ê yên hêja, yên weke Îsmet Sezgîn, rojname û televîzyonên wan ên demokrat û aştiyewaz! dest bi demegojî û virrên xwe yên gemar, klasîk û kevnare kirin. Bi devê wan gerîla neheq û ew jî her biheq bûn. Li ser van propagandayên wan, dîsa ew gotina: “Kî neheq be Xwedê bela wî bide”, hate bîra me.

Rastî ev e: Heta ku TC hebûna gelê Kurd, mafên wan ên demokratîk û siyasî qebûl neke, heta dev ji vê demegojî û siyaseta xwe ya înkariyê bernede, ev mesele hel nabe û girêk nabişkive. Divê TC gavên rast û cesûr biavêje. Dawîya virran pûç e.

Sî-çil milyon gelê Kurd serê xwe hildaye. Weke hemû gelên cihanê, ew jî êdî serfirazî, mafên însanî, siyasî û demokrasîyê dixwaze. Ji bo bidestxistina van jî dest avêtîyê şerê çekdarî. Mafên xwe dixwazin. Êdî virr, derew, kuştin, zîlm û zor nikarin rê li ber vê lebata azadiyê bigirin. Divê TC hişê xwe rind bide serê xwe. Biratiya gelê Tirk û Kurd nepelişîne. Gavên cidî û cesûr biavêje. Êdî ev rewş bi virran nameşe.

Hakî Karer bingeha şoreşa Kurdistanê bi xwîna xwe avêt

Şükrü Gülmüş

Dar berî ku pelên xwe ve-kin, çaviyan girê didin, av di wan çaviyan de digere û rewşa hewr û tavên wê, bihar mezinbûna pelên wan çaviyan bi mirov dide xuyakirin.

Heval Hakî Karer jî, weke çaviya ku ne av, lehî tê de bigere bû. Tirk bû. Şoreşger bû. Suxte bû. Pêşeroj û welatê xwe di şoreşa Kurdistanê de didît. Dema ku hîna li Tirkîyê û li Kurdistanê li ser statûya Kurdistanê, gotûbêja dagirkerî an jî, ne dagirkerîbûnê çêdibû, H. Karer biryara xwe ji zû ve dabû û dest bi têkoşîna xwe li Kurdistanê kiribû jî. Çepê Tirk û pîrr çepên Kurdistanê hîna jî, ji binê bandora ramana kemalîzmê derneketibûn, H. Karer tevî mirovbûna xwe ya Tirk, hem xwe jî ramana kemalîzmê û hem jî, rîya ku ta niha ne çepê Tirkan û ne jî çepên Kurdan dîtibû, dît. Ne tenê dît, li gorî vê dîtina xwe jî, xwe avête nava sînga têkoşînê.

Hakî Karer, di pratîka xwe de pîrr tişt fêrî şoreşgeran kir. Hakî Karer, di nava têkoşîna xwe de hem himalî dikir pê xwe û hevalên xwe xwedî dikir û hem jî têkoşîna xwe pîrrî caran bi serê xwe didomand. Bi vê bîr û bawerîya xwe hewl dida hevalên derdora xwe û weke


deh kesan ku bixebite berhem distand.

Hakî ne bi şoreşgertiya xwe tenê, bi exlaqê xwe jî dibû mînak. Bi jiyana xwe şoreşgerekî profesyonel bû û ji bo şoreşê çî hewce hebûna dianî cih. Li gor ku dema hate şehîdkirin (18 Gulan 1977) hîn partî, artêş! enî û hwd. tevgirêdanên wiha, çareserkirina radîqal datanîn ber xwe tunebûn jî, ew profesyonel dixebitî û rojên dûr didît û li gor wê dîtîngot.

Hakî ne endamê şoreşa Kurdistanê tenê bû. Ew bi her tiştê xwe înternasyonalîst bû û li gorî înternasyonalîzmê têkoşîn dida, wî bi xwe jî, ev têkoşîna xwe wiha formule dikir: "Xelasiya welatê min rasterast bi şoreşa Kurdistanê ve girêdayî ye." Ev dîtînen wî, rastiya marksîzmê ye, rastiya diyalektê ye. Lê gava ku em îro li hin çepên Tirk û Kurd dinêrin, ji dêla wan em jî înternasyonalîstbûna wan şerm dikin!

Hakî bingeha şoreşa Kurdistanê bi xwîna xwe avêt... Xwîna xwe tevî xwîna şehîdên berî xwe kir. Taybetiyeke Hakî hebû ew jî ev e; Hakî hem leşker bû û hem jî serleşker.

Leşker li Kurdistanê zêde dibin... Serleşker zêde dibin... Berxwedan zêde dibin... Serhildan û Hakî zêde dibin... Neyar jî, tune dibes.




XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zilanî

Çeperast: 1-Berpirsiyarê Radyoya Yêrîvanê. Di wênê de tê dîtî 2-Berhem, karpêk/ Qûm 3-Ambalaj, bestek/ Navê xwarineke Kurdî. Nan di nav dewê çortan û di conî de ta ku bibe hevîr tê kutan û dû re di nava dew, rûn û hingiv de tê tevlihevîkirin û xwarin 4-Li Rojhilata Navîn navê welatekî/ Pêçîk/ Yaxût 5-Kaxezê kopîkirinê ya ji qarbon/ Qaf 6-Navê rojekê 7-Ê ku karê dîn û dinyayê ji hev vediqetîne/ Celxe, zûl 8-Sembola Îrîdîûmê/ Bîrdarî, hêkel 9-Televîzyoneke Almanî/ Derd, kul 10-Hestiyê piştê, marîpişt

Serejêr: 1-Rejîma sermayedaran 2-Qurf, leqat, berhevîkirina bermahiyên fêkî, zerzewat, zad û hwd./ Êzing, kirş û qalên şewatê 3-Daketî, daxistî/ Sembola Fransiyûmê 4-Pozîtîf/ Gizir, kozere, pûta sewalan 5-Kinnivîsîna rêxistina îstîxbarata Tirkîyê/ Alî, hêl/ Mîr 6-Qertafa pîrrhejmariyêya/ Navekî jinan 7-Aram/ Beşek ji nava xanî 8-Rêç, şop/ Koma zanbaran 9-Benê ku ji pirça bizinan tê çekîrin 10-Xwediyê erd, zevî û gundan 11-Pereyê hin dewletên Ereb 12-Gir, gaz

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12



BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇUYÎ

Çeperast: 1-Malmîsanîj 2-Antîdot/ Nîre 3-drezîn/ Yar 4-Ûd/ AA/ Naland 5-Volt/ Carina 6-Arî/ Rû 7-Nasandî 8-Nas/ Înc 9-Nîl/ To 10-Fîstan
Serejêr: 1-Mazûvan/ Of 2-An/ Doran 3-LTD/ Lîsans 4-Mîrat/ Asî 5-Îdea/ Rn/ La 6-Soz/ Cûdî 7-Atîna/ İnt 8-Narîncok 9-In/ Li 10-Jîyan 11-Rana 12-Derd

QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiye razînin:

Li derve: Y. Serhat Bucak

İş Bankası Çağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Li Tirkîyê: 385393

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopiyeye pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

Navnîşana Welat: Başmusahip Sok.

Talas Han 16 Kat:3 No:301 Çağaloğlu /İstanbul

Tel (fax): 512 12 87

Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM

Li Kurdistanê, zarok bawer nakin ku zû mezin bibin û ji bo azadiya xwe û serxwebûna welatê xwe têbikoşin. Dilşa bin û serbilind bin. Zarok her dem ji dê û bavên xwe dipirsin:

– Ka emê kengê mezin bibin?

– Ka emê kengê têbikoşin? Ka êdî heval çima me jî nabine ba xwe? Emê kengê bi çek û rext bin?..

Ev jî dide xuyan ku, ji bo azadî û serxwebûna Kurd û Kurdistanê, gelê Kurd bi jin, zarok, kal, pîr û mêran ve bawerî bi vî şerî anîne,

Mînak; gelek mîrên bi jin û zarok, zar û jinên xwe dihêlin tevî refên gerîla yên ARGK'ê dibin. "Rawestî ji me re nabe, bes e koletî" Zarokên biçûk çav bi hêzên dagirker dikevin bi nefret û hêrs dikin qêrîn: "Herin ji welatê me derkevin, herin em we li welatê xwe naxwazin. Bijî serok Apo! Bijî serhildan!" Dema ku dayîk ji zarokên xwe aciz dibin nifirên wiha lê wan dikin: "Tu nemînî, ma ne xuyaye ji te mirov dernakeve? Ma tuyê bibî mirov? Însan weke zarokên xelkê derkevin serê çiyar ji bo însanetiyê şer bikin, tuyê tolaziyê bikî, tu qet nemînî êdî bes e." Li Kurdistanê ji gotinên rojane çend gotinên balkêş...

Dîlan di wêneyê de tê dîtîn, bavê Dîlanê şervanê azadiyê ye, yanî gerîlayê ARGK'ê ye. Xeynî Dîlanê sê xwişkên wê yê din jî hene; Ebrû û Rûken. Ji Dîlanê mezintir in, pey Dîlanê jî Mizgîn heye. Xeynî bavê Dîlanê du apê Dîlanê yên din jî gerîla ne.

Ev fotografê Dîlanê sala par na, pêrar bavê wê kişandiyê. Ji ber vê yekê, hez ji vî fotografê

Hêviyên zarokên Kurd



xwe dike û dixwaze diyarî arşîva rojnameya Welat bike.

Dîlan jî her roj ji dayîka xwe dipirse ka kengê?.. Min jî, ji Dîlanê pirsî Dîlan ka kengê? Dîlan piçekî fikirî, got: "Vê carê heval werin ez bi wan re diçim."

– Dîlan tu ne biçûk î? Ka tê bikaribî çî bikî?

Dîlanê bersiva min wiha da ku min zimanê xwe gez kir: "Ez karim her tiştî bikim. Ezê dijmin bikujim" Dema ku Dîlanê wisa got, dayîka bavê Dîlanê, dayîka 3

heb şervanên azadiyê meta Pîroze hilmeke kûr û dirêj kişand bi neviya xwe şa bû. Li min zivirî kenî, ji min re got: "Keça min va ye tu dibînî êdî ez jî bûme dibistanek, 3 şagirtên min hînbûna xwe qedandin, çûne ser karên xwe ez bextiyar û serbilind im. Ev şagirta min a biçûk jî, welatparêzeke hêja ye." Dayîka Pîroze ji neviya xwe dipirse: "Ka bibêje Dîlan, ji bo ku tu bigihîjî bavê xwe divê em çî bikin?" Hîna zimanê Dîlanê baş nazivi-

re ji ber vê yekê zehf zor dide zimanê xwe.

DAYÎKA PÎROZE

Bi kurtasî jineke welatparêz û hêja ye. Li Kurdistanê, li Melazgirê jiyana xwe didomîne. Li bendî azadiya xwe û serxwebûna welatê xwe ye. Ew jî, ji sala nû azadî û serxwebûnê hêvi dike. Lê, ji niha ve tiştêkî girîng difikire: "Piştî rizgarkirina Kurdistanê jî bila azadîxwaz dev ji dozê bernedin. Talanên me yên ku hatin şelandin jî, bila bîn standin."

dibêje: "Ev çar dagirker deyndarên me yên hezar salan in. Ger em deynê xwe jî, ji wan bistînin, welatê me dê pîr dewlemend bibe." Meta Pîroze pîr sohbetxweş e. Bi bîr û bawerî ye fikrên wê balkêş in. Weke keçeke ciwan dilgerm e. Ez dayîka Pîroze, ji zarokatiyê ve nas dikim.

Mala wan ji gundekî Melazgirê hate taxa me. Du hêviyên wê hebûn. Zehf bêdeng bû. Her dem bala mirov dikişand, ker û laliya wê. Ne diaxivî, ji sibehê heyaniê êvarê dixebitî. Pez didot, berx dimêjandin, teşî dirêst, hirî dikire rîs. Carina ku bi jinên cîranan û dayîka min re bi axiviya jî, ji jiyana xwe gazin dikir û digot: "Xwezî êdî ez bimirama, xelasbûna jiyana min bi sîr û pîvazekê nake."

Belê îro rihê wê yê kole miriye. Ew rihê ku jê re digot: "Bi sîrekê nake", îro jê re dibêje "Bûme dibistan."

Belê ev der Kurdistan e, hola şer e. Êdî Heso mîr e, Besê jin e tune ye, şêr bû şêr çî jin, çî mîr. Li Kurdistanê, xortên hêja û canfîda çawa hene, jinên mîna dayîka Pîroze hêja, jîr jî hene. Xortên hêja ji dayîkên hêja dibin. Ev gotina mezinan vala nîn e ku gotine: "Heft bavên çê an şîrê dê." Meta Pîroze her hefte tê ji min dipirse "Ka rojnameya me ji min re bixwîne (Welat). Bila hişê min geş be."

– Dayîka delal tu dixwazî ji xwendevanên Welat re çî bibêjî: "Ez ji dayîkên hemû şehîd û şervanên welat re silavên xwe dibêjim serkevtina xebatên rojnameya Welat di 1993'yan de dixwazim û hêvi dikim."

Încî Egîd

BI CIWAN HACO RE HEVPEYVÎN



CIWAN HACO KÎ YE?

Ez di sala 17.8.1957'an de li gundê (niha bajar e) Tirbespiyê li başûrê rojavayê Kurdistanê hatime dinyayê.

Min çavê xwe vekir û tembûr li mala me hebû. Di mala me de bavê min, du birayên min ên ji min mezintir û xwişka min a biçûk dizanin li tembûrê bixin. Çûyîn û hatina Yêzîdiyên Torê û Şingalê gelekî bi şer me ve hebû, ew jî bêhtir wan tembûrvan bûn. Ez 12 salî bûm, rehmetî dengbêjê hêja Mihemed Şêxo bi hinceta kar hate Tirbespiyê û bû cîranê me. Ew seraqet li mala me bû û di

civatên taybetî de min pê re distrand, di qaseteke wî de ku zarokêk pê re distrêne, ew zarok ez im. Kêfa rehmetî gelekî ji min re dihat û ew ji min re bû wekî mamosteyekî rewanî. Di 14 salî de min qaseta xwe ya yekemîn weşand û min stranên ku hatibûn Tirkîkirin ji nû ve bi Kurdî gotin.

Cara pêşîn ez di sala 1978'an de derketim pêşiya gel. Wê salê dewleta Sûriye rê dabû grûbên folklorê Kurdî ku çalakiyên xwe pêş gelê Kurd bikin. Wê salê di nav grûba folklorê ya Navenda Kulturî ya bajarê Qamişlo de ez wekî dengbêjêkî sereke derketim pêşiya xelkê. Di sala

1979'an de hatim Ewropa û li Almanya li Bochum rûniştim. Ji hengî ve bûme muzîkvanekî profesyonel û heta niha 7 qasetên min hatine weşandin.

Dema hatime Almanya min bakalorya (lîse) Sûrî qedandibû û li Almanya min qedera 2 salan gîtar xwend, lê ne li zanîngehê. Pey re min dest bi xwendina ilmê muzîkê li Unîversîteya Bochumê kir, lê ez zû jê geriyam. Li Almanya jî, ez li du xortan rast hatim. **Teo Ewichter** û **Leo Petrov**, yek daholvan (drums) bû û yê din jî li gîtara bass dixist. Ev herdu camêr jî heta derekî bûne sebebê bijartina vî rengê muzîkê ku ez îro pê tême naskirin.

Em bi pîrseke klasik dest pê bikin. Muzîk ji bo we tê çi maneyê? Hûn muzîkê çawa tarif dikin?

- Muzîk ji min re tê maneya jiyane, evîne û bizavê. Ev jî bersiva min a klasîkiyê ji pîrsa we ya klasîkî re. Lê rast bê gotin, muzîk mimkun e kevntirîn huner be di heyîne de, ew bi kevnahiya deng û peyvan e. Muzîk harmoniya dangan e ku şehreke wê ya taybetî heye.

Muzîk ew çekê nependî ye ku gelên bindest her û her li dijî sitemkaran bi kar aniyê. Ez dirêj nekim, muzîk ji min re ne tenê haceteke kêm û xweşî ye: lê pêwîstiyêke jiyane ye. Ji destana **Memê Alan** bigire û heta bi stranên me yên şeran, dilokên govendan, stranên palehiyê, palûtê û stranên şîne hemû isbata vî tiştî ne. Li dawiyê dixwazim bibêjim muzîk ew rêwîngiyê ku ne hewceyî tu pasportan e, ew zîmanekî cîhanî yê bi tenê ye ku mirov dikare pê hemû sinoran derbas bike.

Mirov zehmetiyê dikişîne ku muzîka we tixe kategoriyeke. Di qasetên we de formên rock, pop û folk tene bikaranîn. Di orkestrasyona hin stranên de jî tembûr û gîtar bi hev re deng didin. Hûn dikarin vê meseleyê hinekî vekin?

- Ez ne alîgirê wî tiştî me ku, muzîka min bixin kategoriyeke xuya. Di muzîka min de elementên ji **rock, pop, blues** û şeweyên muzîka Rojavayî yên din jî heye. Derketina min a ji welat û jiyana li welatên Ewropa Rojava, di gel tîkîlûbûyîna muzîka Rojavayî, béguman kiriyê ku muzîka min bikeve bin bandora wan textlîte muzîkê. Pîrsa bikaranîna tembûr û gîtarê bi hev re rast e, lê ne min dest bi vê kombînasyonê kiriyê. Ev tişt di muzîka Tirkî de jî mêj ve heye û gelekî xweş e. Kombînasyona hacetên muzîkê yên Rohilatiyê û yên Rojavayî ne kirineke yekalî ye, muzîkvanên Rojavayî jî hacetên me bi kar tînin. Ji bo nîmûne bikaranîna sîtar a Hindî û

ûd ê di muzîka Rojavayî de êdî ne sansasyon e.

Muzîka we gerek e bi çi bê navkirin? Ciwan Haco kîjan muzîkê çêdike?

- Ev pîrseke zehmet e û ez naxwazim navekî muheded li muzîka xwe bikim, lê bi gelemperî dikarim navê "**muzîka Kurdî ya nûjen**" lê bikim. Gava dibêjim nûjen, behsa reng û naverokê dikim. Rengê muzîkê jî her kesî re xuyaye, lê naveroka muzîka min tevî ku ji aliyê temayên xwe ve ne nû ye jî, lê ji aliyê awayê berveçûna teman ve "nûjen e". Babetên stranên min welat e, şerê azadiyê ye, pîrên civata me ne, jîn e û siruştê Kurdistanê ye. Piştî qaseta yekemîn, **Pêşmerge**, min hêdî hêdî xwe dûtî helbesta Kurdî ya klasîkî kir û min helbesta serbest bêhtir nêzîkî xwe dît. Ez karim bibêjim ku şairê hêja Rojen Barnas çavê min li vî tiştî vekir û min gelek helbestên wî kirine stran. Pey re û nexasim di qaseta "**Si û Sê Gulle**" de, min helbestên gelek şairên nûhatî û kevin strandin. Ez xwe mîna dengbêjêkî **rock, jazz** an jî **blues** nabînim, tevî ku şûna van cureyên muzîkê di muzîka min de xuyaye. **Tom Waits** û **David Byrne** du dengbêjên bi nav û deng in, lê ne şagirtê tu medreseyên muzîkê yên taybetî ne, ew rock, folk, jazz, marş, muzîka Amerîka Latîni pop bi kar tînin. Wan muzîk ji xwe re kiriyê meydana tecrûbeyê û berhemên nû peyde dikin. Ez jî dixwazim vî tiştî bikim û di pêş de ezê rîtmên Efrîkî û yên Amerîka Latîni bi kar bînim. Tiştêkî din jî heye, min jî bîr kiribû. Ez behsa tesîra biyanî li muzîka xwe dikim, lê muzîka folklorî ya Kurdî jî muzîka min re mîna hestiyê piştê ye, dihêlê ku muzîk xwe ragire û li ser piya bimîne.

Em dixwazim dîtînen we yên li ser muzîka gelêrî hin bibim. Der heqê muzîka Kurdî de hûn çi difikirin?

- Hunerên gelêrî yên Kurdan, di nav de muzîk, yek ji stûnên herî bîngehî yên çanda miletê Kurd

e. Di nava hunerên gelêrî de cihê muzîkê bellî ye. Muzîka me Kurdan heta niha bêhtir gelêrî ye û eger mirov rola muzîkê ya gelekî muhîm û mezin di jiyana Kurdan de bide ber çavê xwe, mirovê bibîne ku bê muzîka gelêrî çendî girîng e. Lê cihê mixabîniyê ye ku ji bêxwedîtî tê talankirin û windabûn. Hunermend û dengbêjên jîr wek **Feqiyê Teyran** (Nizamettîn Arîç) bi derengî jî be bi vî tiştî hesiyar û karên hêja kirin û dikin, lê heyf gelek an ev kar ji wan kire eyib.

Muzîka gelêrî bi rîtm û awazan gelekî dewlemend e û kehniyeke bê dawî ye ji me dengbêj û muzîkvanan re. Yek ji hêviyê min ew e ku ez dilokên dengbêjê nemir **Miradko** ji nû ve û bi awayekî nûjen bistrêm.

Di van salên dawî de, li welatên Rohilatiyê navên xerib derdikevin. *Wek Rock a Tirk, Muzîka Pop a Kurdî...* Ev sîfat li gor we çiqasî rast in? Navkirina rockê, popê, new age û muzîka klasîk bi navê miletekî ji we re çiqas rast tê? Ger hûn van sîfatên rast bibînin pîvanên we çi ne? Rocka Îngilîzî û Amerîka çiqas ji hev vediqete?

- Berê çî li Ewropa û Amerîka û çî li deverên cîhanê yên din rengên muzîkê bi sedsalan nedihatî guhertin, lê ji 1930'î û vir ve, li Amerîka bi taybetî tu rengêkî muzîkê zêdeyî heşt salan dom nake. Di nava çend sala de muzîkên bi navê swing, rock and roll, rock, blues û hwd. derketine holê. Tefsîra vî tiştî bi pêşketina mezin di warê ragihandinê de, koçbûna di navbera welatan de û di nava welatan bi xwe de, mîna koçbûna rêçên Amerîka ji başûr ber bi bakur ve û bajarên ve û ya gundiyan Anglo-Amerîkanî ber bi bajarên ve, girê didin. Yanî rock û pop û hwd. tarîxeke wan heye, ew li zemîneke xuyayî û di civateke xuyayî de û li ser bîngeha folklorêkî xuyayî peyde bûne. Lewma ne bê problem e dema em sîfatên weke Pop a Kurdî û Rock a Tirkî bi kar binin. Em îro halê hazir piş-

tî 40-50 salî li şeweyên wan muzîkan xwedî derdikevin, hêyî ku em guh bidine bar û doxên civakî û dîrokî yên li dora wan şeweyên muzîkê. Rock xwedî tîkîliyeke qewîn bû bi radîkalîzma civakî û siyasî re li Rojava. Lê li welatên Rohilatiyê bêhtir muzîka "Rojavahezan e".

Sîfata "Pop a Kurdî" ne bê serêş e, gelo muzîkeke ku deng bi Kurdî be lê yên lédixin biyanî bin, muzîkeke Kurdî ye? Tîpa ku bi min re lédixê ji bilî yekî Tirk hemû Ewropî ne. Çend komên Kurdan henê ku muzîka pop lédixin?

Rocka Amerîkî bêhtir li ser muzîka reşikan (black music) mîna **roots, country** û **blues** hatiye avakirin, belê Rocka Îngilîzî bêhtir xwe spartiyê muzîka gelêrî ya Îngilîzî (keltic music). Lê nefîceya dawî roja îro jî hev ne gelekî cuda ye, ji ber ku herdu aliya li hev guhdar kiriyê. Mirov dikare bibêje ku rock bûye xwedî îmajêke dinyayî.

Me li gelek qasetên we guhdarî kiriyê. Paradoxêke muzîka we heye bi baweriya min, ew jî ev e: Gotin û muzîk li hev nayên, ji hev re biyanî ne. Di gelek parçeyên we de gotin herêmî folklorîk dimînin, muzîk jî modern e. *Wek parçeya Keçikê, "Hey keçikê tu were/ Nazikê tu were/ Te'z kuştim helandim/ Çi bêjim ji te re..."* Li gor we tîkîliyên gotin û muzîkê çî ne, gerek çawa bin?

- Baweriya min jî wilo ye ku, gerek e gotin û awaz hevdu bigirin û li hev bên. Lê eşkere ye ku yek naverok an babet dibe ku bi gelek rengan bê pêşkêşkirin. Ew jî li gor hostatiya afrênerê berhemê ye. Gotinên strana "**Keçikê**" û gelek stranên qaseta **Serhildan** gotinên herêmî û gelêrî ne û dibe ku cara pêşî û diduya li guhên mirov xerîb were, wan gotîna bi muzîkeke nûjen û bi rîtmêke yekcar biyanî bibihîze. Lê ez bi xwe ve mîna paradoxêkê nabînim. Wekî din jî ez naxwazim dest bidime gotinên stranên me yên gelêrî, bi baweriya min destdayîna gotinên

stranan, çî gelêrî û çî wekî din, neheqî ye. Heqê kesî nîn e bi kêfa xwe dest bide kelepora gelê Kurd.

Madem gotin hatiye ser tekstên stranên dixwazim bibêjim ku, ez zehmetiyêke mezin dibînim gotinên minasib û aktuel peyde bikim. Mixabin li Kurdistanê gelek mirov şîr dinivîsin, lê nivîskarên tekstên stranên nîn in û gelek cara dengbêjên Kurd neçar dimînin bi xwe gotinên xwe binivîsin.

Ji bo dawî çî dixwazim bibêjin?

- Berî her tiştî memnûn im, ku Welat deriyekî nû ji me re vekir ku em tê de hinek bîr û bawerî û derdê xwe jî miletê xwe re bibêjin. Béguman e ku Welat îro yek ji stûnên herî qayim ji yên hebûna me ya ramyarî ye. Lê divê em zanibin ku di navbera me û gelên din de ferqeke gelekî mezin çêbûye. Lewma jî hêviya me heye Welat û xwişkên wê rojêkê ve ferqê ji holê rakin û çapemeniya Kurdî bigihînine banekî bilind. Li vir divê silavên herî germ pêşkêşî wan rojnamevanên mîrxas bikim ku canê xwe di rîya Kurdistanê serbest û yekhev de kirine qurban. Rojname, stranbêj û hemû cureyên huner, hacetên pêwîst in ji bo azadiya gelê me. Lê bêsîk gotina herî dawiyê, devê lula tîfinga pêşmergeyan e, lewma hezar, hezar silav li pêşmergeyan Kurdistanê. Ew serbilindahiya gelên me ne. Îro diwarên dijîmîniya nav xwe diherivînin. Em bi hev re nehêlin carekî din ew bilind bibin. Li dawî jî dixwazim hinek gazinên xwe bikim. Li ser rûpelên Welat car caran bi navê rexne hinek tişt di der heqê min de hatine gotin. Lê heyf e, ew gotin ji rexne bêhtir îthamên bêbingeh bûn. Xwediyên wan îthaman jî, ji wan fikrên ku ew xwe pê bi nav dikin gelekî dût in. Rastî ne hema reş e an spî ye, an dost e, an dijîmîniya. Ez hêvî dikim me hunermendan nekîşînin nav qada pevçûn û dijîmîniya hêzên siyasî. Ez bi çavekî baş li rexneyê dinêrim. Rexne pêwîstiyêke jiyane ye, ji bo pêşketina her hunerî.

welat

• Li ser navê ÎMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
• Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
• Navnîşan (Adres) Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 • Tel (fax) 512 12 87
• Berpirsiyariya Ewropa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
• Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ.